

## Rol, deng û reng

Di belgeyeke dîrokî de ku ji dema Behlûl maye û di sedsala 19'an de li gundê Şehrezor (Hizar Mîred) ê ser bi bajarê Silêmaniyê hatiye bidestxistin, çar beytên helbesta bi zimanê pehlewî nivîsiye, hebûye... ***Zehra Mohammedzadeh / R.2***



## Hincê

Li gorî rîwayetê mîrekî Herekolê hebûye. Keçeke gelek spehî ya Mîr hebûye. Mîr naxwaze keça xwe bizewcîne lê mala wî ji xwazgîniyan xalî nabe lewre mîr şertekî giran datîne ber kesên keça wî dixwazin... ***Mem Avba / R.5***



## Pergala korezanî

Qanûnên fizîkê aşkera ne. Heke mirovahî zorê bide ahenga heyî ya xwezayê, xweza serê xwe natewîne. Berevajiyê vê, serî radike. Pêlên behrê, ba û bahozên hişk û ziyankar, hilm û hewaya jehrî, qulên ozonê... ***Ehmed Pelda / R.7***


# xwebûn

23-29 MIJDAR 2020 HEJMAR: 49 BUHA: 4 TL rojname@xwebun.org


# Reforma darazê bi bêhiqûqiyê dest pê kir



Li Tirkiyeyê kengî desthilatdar behsa hiqûq û edaletê bikin herî zêde wê demê bêedaletî û bêhiqûqî pêk tê. Piştî ku hikûmetê ragihand ku dê reforma darazê pêk bînin li ser hev biryarên bêhiqûqiyê tên dayîn. Daraza tirk kujerên Kemal Kurkut beraet kirin, bi dehan parêzer û siyasetmedarên kurd hatin binçavkirin. Dayika Kemal Kurkut, Sîcan Kurkut wiha bertek nîşan da: "Çima edalet tune ye? Ev edaletek çawa ye, kesek ku ciwanekî dikuje serbest tê berdan?" Parêzera malbatê Reyhan Yalçindag anî ziman ku heta kujer bê cezakirin dê têkoşîna xwe bidomînin... ***R.3***

LI DIJÎ PARASTINÊ OPERASYON

## Gelek parêzerên kurd hatin binçavkirin... ***Nûçe / R.3***

# Pandemiya esasî tundî ye

Rojnameger û siyasetmedar Meral Çîçek bi boneya 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Jinan ji rojnameya me re axivî û wiha got: "Hişmendiya serdest bi hezaran salan in bi çewisandin û tepisandinê xwe li ser jinan rewa kiriye û navê jinan ji dîrok, aborî, siyaset, civak û hwd. biriye û tenê jin wek 'kebaniya malê, dayik, xwişk, dergistî, fahîşe...' pênase kiriye. Bi vî awayî jî tenê ne tundiya fizîkî tundiya psikolojik jî lê ferz kiriye. Dema têkoşîna jinan bilind dibe pergal jî dikeve pozîsyona parastinê û êrîşên xwe yên li ser jinan zêde dike."... ***Hevpeyvîna Bêrîvan Kayî / R.4***

## Wayîtîya hirê perperikan

Hirê wayê bi nameyê Patria, Minerva ve Marîa Teresa estbî. Înan rê perperik yeno vatene. Nê perperikî dinya de ca nêvedayî ke nêşîyî û nêdîyî. Boya pêroyê dinya arê dayêne û dima ra vila kerdêne, bi no hawa rengê tabîatî viraştêne. Rengînî her ca de bi firayîşê înan virazîyayêne. Nê wayî hem tam û hem zî rih dayêne tabîat. Gandaro tewr sivik ê dinya perperike ya, labelê barê înan hende sivik nîyo. Perperike bi xo nêfirenê û nêgêrenê, perperikî çimê dinya yê. Her çiqas çîmê înan her çî bivînê zî çîyê ke dîyî nêbenê xelasîya înan. Coka ra emrê perperikan kilm o. Sebebêk bîn ê kilmbîyayîşê emrê înan zî oyo ke emrê xo bexşê tabîatî kenê. Senî ke merdim tewrê tabîatî bî, rengê tabîatî bedelîya. Rengê pêroyê rengan şî û rengînî cayê xo da bêrengînî... ***Av. Cemîle Turhalli / R.9***



## Çima Başûr tê cezakirin?

Li ser meseleya mûçe û têkiliyên di navbera Bexda-Hewlerê de em bi rojnamgerê başûrî Rêbaz Hesen re axivîn. Hesen diyar kir ku PDK hemû neft radestî Tirkiyeyê kiriye û ne haya partiyên di parlamentoyê jê heye ne jî ya gel. Rêbaz Hesen destnîşan kir ku PDK ne li ser navê hikûmeta herêmê, li ser navê xwe ev peymana 50 salan bi Tirkiyeyê re îmze kiriye. Hesene got ku beşeke başûrê Kurdistanê radestî Tirkiyeyê kirine.***R.6***





## Mirovê herî temendirêj mir

Mirovê herî temendirêj ê cîhanê, kurdê bi navê Ehmed Sofî yê ji bajarê Seqizê yê rojhilatê Kurdistanê, di 138 saliya xwe de jiyana xwe ji dest da. Kane Tanaka ya Japon ku weke mirova herî temendirêj a mirovahiyê tê nasîn, di 117 saliya xwe de jiyana xwe ji dest dabû... ***R.3***

## Nexweşiya koronayê û hin tedbîrên trajîkomîk

Bi Kovîd-19'ê ya salek berê ji Çînê belav bû û hemû cîhan xist bin bandora xwe, Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) wek pandemiyê ragihand. Li gorî rêjeyên herî dawî yên hatine parvekirin niha li ser rûyê cîhanê nêzî 56 milyon û 245 hezar kes bi koronayê ketine û nêzî milyonek û 350 hezar kesan jî jiyana xwe ji dest dane. Li gorî serokwezîrê tenduristiyê yê Tirkiriyeyê heta niha 430 hezar kes bi koronayê ketine û 11 hezar û 943 kesan jî jiyana xwe ji dest dane. Endamê konseya Yekitiya Bijîşkên Tirk (TTB) Dr. Halîs Yerlîkaya da zanîn ku ev daneyên pêkatiyan ji rastiyê dûr in û wiha got: "Tedbîrên tên girtin kêm in. Ji bo vê yekê jî em wek saziyên sivîl bifikar in"... ***R.6***

## Çîrokên me û pedagojî

Di çanda civat û dewletên paşvemayî de, heta van salên dawî ji bo zarokan çîrokxwendin an pirtûkxwendin gelek kêm bûn. Di nav gel de, ne tenê xeberoş, çîrok, fabil û destan hebûn û bi devkî dihatin gotin. Ji wan kesên ku bi devkî çîrokan dibêjin re jî çîrokbêj dibêjin. Wekî dengbêjan piraniya çîrokbêjan jî nexwenda bûn, ji ber dizanibûn. Di zemanê berê de çîrokbêjan di şevên zivistanên dirêj û tarî de li civatan çîrok digotin. Li bajar û bajarokan jî êvaran li hin mal, qonax û qehwexaneyan çîrokbêjan çîrok vedigotin. Dema mirov van çîrokan ji aliyê pedagojî û wêjeyî ve binirxîne... ***Amed Tîgrîs / R.5***

## Dîroka hackeriyê û hackerên navdar

Hin kes hackeran bi lehengên romantîk lê hin kes jî wan bi sextekariyê bi nav dikin. Ji îcadkirina telefon û kompîteran heta roja me, gelek hacker derketin û bûyerên hackerî çêbûn. Hackerî, carinan bi rûyê sextekariyê, carinan jî bi rûyê siyasî derketiye pêşberî me lê divê em ji bîr nekin ku hacker û hackerî rastiyeke roja me ya îroyîn e. Ew ê her tim hebe. Nivîskar Aldous Huxley tekildarî mijara hacker wiha dibêje: ''Hacker bi armancekê tevdigere, hem romantîk e hem zalim e. Hacker dikare bibe şoreşger an jî belengazek.''... ***Occo Mahabad / R.8***

## Pîvana paradîgmaya nû

Dikare were gotin ku nêçîrvaniya kûrbûyî Leviathanek welidand û ev Lev-îathan bû sedema 3 şerên mezin ên cîhanî û mirina bi milyonan mirovên ku rasterast bi nêçîrvaniya kûrbûyî (kuştin, gulebarankirin) re têkildar in. Heta ku anarşîst, femînîst, sosyalîst, komunîst, demokrat û hwd yên îro li cîhanê li ber xwe didin, piştgiriyê nedin çalakiyên mafdar ên vejeteryan û veganan dê hilberîna desthilatdariyê û şer bidomin. Ji hêla zanyaran ve hatiye destnîşankirin ku yekem çavkaniya xwarinê ya mirovên prîmîtîve (seretayî) berhevkarî ye. ***Serhad Kaya / R.12***

# Li dijî dîktatoriyê berxwedana sê 'Perperik'an

Navenda Nûçeyan

Her sal 25'ê Mijdarê wek Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Jinan ji aliyê jinan ve, li her dera cîhanê bi çalakiyên cur bi cur tê pêşwazîkirin. Ev dîrok jî wekî gelek dîrokan ji aliyê jinan ve xwedî cihekî girîng e. Ev roj, hem roja qetilkirina sê jinên berxwedêr Maria Teresa Mirabal, Minerva Argentina Mîrabal û Patria Mercedes Mîrabal e û hem jî roja serkeftina têkoşîna van her sê jinên berxwedêr e.

Sê xwişkên berxwedêr ku di dîrokê de bi navê Xwişkên Mîrabal tên zanîn, bi têkoşîn û pêşengiya xwe û her wiha bi dayîna canê xwe dawî li dîktatoriyê anîn ku bi dehan salan li welatê wan serdest bû.

**Komara Domînîkê**

Welatê Xwişkên Mîrabalê Komara Domînîkê, nêzî 31 salan ji aliyê dîktator Rafel Trujîllo ku bi darbeyeke leşkerî dest danîbû ser welêt, hat birêvebirin.

Ji Trujîllo re 'Şef' dihat gotin û navên bajar, çiya û hema bêje her tiştî li gorî hişmendiya xwe guherandin. Kesên li dijî vî dîktatorî muxalefet dikirin, an dihatin kuştin an jî dihatin girtin, wendakirin. Trujîlloyê ji kuştina 50 hezar kesan berpirsyar e, hemû raperînên li dijî xwe bi qetlîman tepisandin. Gelê tehemulî dîktatoriya wî nedikir vê carê dest bi rêxistinên veşarî kir. Ji van rêxistinan yek jî Xwişkên Mîrabel e, ya bi navê 'Tevgera Clandestine (Perperik)' e.

Ev her sê xwişk, bi hevjînên xwe re li dijî dîktatoriya li welatê xwe bi awayekî veşarî gel bi rêxistin dikirin. Ev pêşengî, rêxistinkirina gel a ji aliyê her sê xwişkan ve û têkoşîna wan a li dijî dîktatoriyê her diçû mezin dibû û ev yek jî bû sedama ku ji hêla Trujîllo ve wek 'terorîst' bên îlankirin. Xwişkên Mîrabel bi gotinên 'xayinên welat in', 'dê zirarê bidin wekhevî û yekitiya welat' gelek caran tên girtin û îşkencekirin. Heta hemû mal û milkên wan ji destê wan hatin girtin lê tevî vê yekê jî dest ji têkoşîna xwe ya azadiyê bernedan. Êdî hatibû wê astê ku dîktator Trujîllo digot 'Pirsgirêka herî mezin a welat dêr û Xwişkên Mîrabel in'.

**Qetilkirina sê xwişkan**

Piştî vê axaftina Trujîllo, di 25'ê Mijdara 1960'an de Xwişkên Mîrabel dema ji hevdîtina hevjînê xwe vedigeriyan, wesayîta wan ji hêla hêzên dîktator ve hat sekinandin. Her sê jinên berxweder ji wesayîtên xwe hatin peyakirin û rastî tecawiza hêzên dîktator hatin û piştre jî bi hovane hatin qetilkirin. Hêzên dîktator ji bo ev her sê jinên berxwedêr, ne ji aliyên wan wekî di qezaya trafîkê de jiyana xwe ji dest dane bidin nîşandan, Xwişkên Mîrabal dîsa siwarê wesayîta wan dikin û wesayîtê ji zinar diavêjin.

Salek piştî qetilkirina jinên berxwedêr tevgera gel ku tu carî bawer nekirin her sê xwişk di encama qezaya trafîkê de jiyana xwe ji dest dane, dawî li dîktatoriya Trujîlloyê anîn. Roja ku sê Xwişkên Mîrabal hatin qetilkirin, di heman demê de bû roja serhildana li dijî dîktatoriyê û di Komara Domînîkê de bû rojeke dîrokî.

Di sala 1981'î de, Komxebata Jinan a Amerîkaya Latînî li Kolombiyayê hatin lidarxistin û di vê komxebatê de 25'ê Mijdarê roja qetilkirina her sê xwişkan wek Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya li Jinan hat aragihandin. Neteweyên Yekbûyî (NY) jî di sala 1999'an de, 25'ê Mijdarê wek Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Jinan a Navneteweyî qebûl kir.

**Perperik**

Nasnavê yek ji Xwişkên Mîrabel Perperik bû. Ji wê rojê şûn de ji bo her sê xwişkan 'Perperik' hat gotin. Her sal roja 25'ê Mijdarê sê 'Perperik' ji aliyê jinên cîhanê ve tên bibîranîn. Her sal jinên cîhanê roja qetilkirina her sê jinên berxwedêr dadikevin qadan û li dijî tundiyê dengê xwe bilind dikin.

Îsal jî dê hemû jinên cîhanê dakevin qadan; dê hem Xwişkên Mîrabal bi bîr bînin û hem jî li dijî her cure tundiyê bibin yek. Jinên Kurdistanê jî bi taybetî jinên bakurê Kurdistanê bi dirûşma 'Em xwe diparêzên' ku çend meh berê Tevgera Jinên Azad (TJA) li dijî her cure tundî, tecrîd, qeyûm û hwd. dabû destpêkirin, 25'ê Mijdarê pêşwazî bikin.






## Biryardariya Xwişkên Mîrabal

Ev gotinên Xwişkên Mîrabal ên li dîrokê hatin nivîsîn û ji jinan re bûn mîrate, biryardariya wan a azadiyê nîşan didin:

-Dibe tiştê herî nêzî me mirin be lê ev min natirsîne, em ê ji bo her tişta mafdar têbikoşin. (Maria Teresa Mîrabal)

-Ji ber welatê me tije êş e, kirina hinek tiştan kêfxweşî ye. Mirov nikarin destê xwe bidin ser hev û rûnin. (Minerva Argentina Mîrabal)

-Em ê destûr nedin ku zarokên me di vê pergalê de ku ji rê derketiye bijîn. Em neçar in li dijî vê pergalê têbikoşin. Ez li ser navê xwe amade me ku her tiştî bikim. (Patria Mercedes Mîrabal)



Zehra Mohammedzadeh

# Di baweriya yarî de jin[3]

**Jin xwedî rol, deng û reng bûn**

Di belgeyek dîrokî de ku ji dema Behlûl maye û di sedsala 19'an de li gundê Şehrezor (Hizar Mîred) ê ser bi bajarê Silêmaniyê ve hatiye bidestxistin, çar beytên helbesta bi zimanê pehlewî hatiye nivîsînhebûye û wiha ye:

Perestgehên agir hilweşiyan, agir hatin tefandin, mezin û navdaran xwe weşartin, tazyan Îran bi axê re wêran kir; hemû gund heya Şehrezorê wêran kirin, jin û keç bi darê zorê revandin û kirin kole; mêrên azad di nav xwîna xwe de gêr bûn, rêbaz û rêûresma yarî bêkes ma, Ahûramazda ji kesî hez nekir.

Bêguman ji ber ku Şehrezor wek navenda kurdên yarsan û cihê baweriya wan tê dîtin, girîng e. Jixwe ji derveyê serdema Behlûl, serdemên Şah Fezl, Baba Serheng, Şah Xuşîn, Baba Bûzork, Baba Hendo, Baba Naos, dema Berzencê û Siltan Sehak…

Di her yek ji van deman de mirov rastî nav û rola hin jinan tê; jin di vê baweriyê de xwedî cihekî girîng bûne.

Yek ji wan jinan jî daye Tewrîz e ku di dema Baba Serheng de, di sedsala 4'an a hîcrî de jiyaye. Ev jina leheng li warê Hewremanê hatiye dinyayê û ji ber vê çendê ye ku jê re Daye Tewrîzî Horamî tê gotin. Ev jina mezin, dikeve pey dengê enderûn, li pey cîhana manewî û dixwaze xwe di vê deryayê de bişo. Ji ber wê jî diçe xizmeta Baba Serheng. Di hêla bawerî û cîhana manewî de xwe kûr dike, di serî de ji jinan, ji civakê re pêşengî dike.

Daye Tewrîz yek ji jinên kurd ên helbestvan ên ewil e. Ev jina kurd a hewramî, yek ji wan jinan e ku cara yekem helbestên wê di pirtûka Serencam de hatine nivîsîn ku zêdetir wek du beytan hatiye destgirtin û nivîsîn. Li gor agahiyên heyî, tê gotin ku mala vê jina mezin wek dibistan û cihekî pîroz dihat bikaranîn. Gelek jin û zilamên yarî ji zanebûn û agahiyên vê jina mezin sûd vergirtine. Her wiha bi tenbûrê, du beytên vê helbestvana mezin ezber dikirin û bi hev re dixwendin.

Tê gotin ku ev jina hêja ji ber evîna xwe ya rêya heq û hewldana xwe ya di vê rêyê de, tê şehîdxistin. Ji bo wê jî vê wek şehîda jin a yarsanî di dîroka kurdên yarsan de her tim bê bîranîn.

***Çend rêzikên wê wiha ne;***
*Cem pî rasanen*
*Cem pî rasanen*
*Yaran, yaweran, cem pî rasinen*
*Her kes nîyokî kerû asanen*
*Cem bî roşenî zîl xasanin*

*Cema yarî, cem a rasan û rastiya*
*bawermendan e,*
*Ey yaran û ey yaweran*
*Cem ji bo rastan tê lidarxistin*
*Başî kirin pir hêsan e*
*Û tevgereke ku herkes bi awayekî dikare*
*başiyê bike*
*Cem dilan ronî dike*
*Û ronî jî hêvî bi mirovan dide*

Her wekî me di rêzikên jor de dît û em ê niha di çend rêzikên jêr de jî bibînin, Daye Tewrîz bi rola pêşengî û belavkirina vê baweriya pîroz rabûye.

*Ey yaran bila dilê we ronî be*
*Bi lez û bez dilê xwe ronî bikin*
*Bibin şopdarê yarî  ku baweriya yarî xwedî*
*rêya ronahî û xweşik e*
*Bi vê dilsoziya xwe ji bo pêşeroja xwe zirhek*
*neyê şikênandin çêbikin.*

Helbet wek me di nîvîsa ewil de jî navê wan rêz kiribû, gelek jinên bi nav û deng hene ku di ola yarî de bi rola pêşengiyê rabûne. Belkî em nikaribin der barê hemûyan de bi berfirehî û dirêj dirêj behs bikin lê em ê di nivîsên pêş de teqez li ser her yek ji wan bisekinin.

Ez dixwazim bi çend gotinan be jî balê bikişînim ser Celale Xanima Loristanî: Mama Celale yek ji jinên bi nav û deng a baweriya yarî ye. Tê gotin ku ew di sala 387'an a hîcrî de, li Loristanê tê dinyayê û di nîvê sedsala pêncan a hîcrî de jiyana xwe ji dest dide. Gora wê deh kîlometre li başûrê-rojavayê Xorem Abadê (Newala Bûwas) ye.

***Çend rêzikên wê wiha ne;***
*Mestem çe bade roy eleste to*
*Wesen yek mî ce dest to*
*ayîn zîlem doşenen çûn mî*
*Co bon bînim mî pereste to*

Meqseda Celale Xanim a bi van çend rêzikan, eşqa ji heqîqet û bedewî û rûmeta xawenkar e ku bi xwezayî hêjayê pirsîn û hezkirinê ye.

Di pirtûka Siyed Mohemmed Hoseynî de hatiye gotin ku Şah Xoşîn der barê Xatûn Celale de wiha gotiye;

Navê diya min Celale ye, bi nasnav rengîn. Ji bo ku ez bizanibim navê min Xoşîn e, ez ji jêr ber bi jor ve û ji cil derbasî cilekî din bûm. Her kesê/a ku min binase, wê kîna di hundirê wî/wê de pak û berteref bibe.

Bêguman dîroka yarsanan xwedî dewlemendiyek mezin a bi her alî ye ku mirov çendî qalê bike jî kêm dimîne. Min bi van sê rêzenivîsan hewl da kêm be jî balê bikişînim ser van şêrejinan û bandora wan a li ser civakê bidim xuyakirin.

***Çavkanî: Lêkolîn û belgeyên komkirî yên Seyed Mohemmed Hoseynî***

# Reforma darazê bi bêhiqûqiyê dest pê kir

Piştî ku hikûmetê ragihand ku dê reforma darazê pêk bînin li ser hev biryarên bêhiquqiyê hatin dayîn. Kujerên Kemal Kurkut beraet kirin, parêzer jî di nav de bi dehan kes hatin binçavkirin

Navenda Nûçeyan




Li Tirkiyeyê kengî desthilatdar behsa hiqûq û edaletê bikin herî zêde wê demê bêedaletî û bêhiqûqî pêk tên. Hikûmeta AKP'ê ragihand ku dê di mijara hiqûqê de reforman bikin û gavên mezin biavêjin. Wezîrê dadê jî ragihand ku ger qiyamet jî rabe dê edalet û hiqûqê pêk bînin.

Piştî van daxuyaniyan daraza tirk li ser hev biryarên bêhiqûqiyê dan. Derheqê gelek siyasetmedar û rojnamegeran de ceza hat birîn û her roj doz li wan tên vekirin. Herî dawî daraza tirk der barê polîsên ku xwendekarê zanîngehê Kemal Kurkut li pêş çavên hemû cîhanê di Newroza Amedê de qetil kiribûn de biryara beraetê da. Rojnameger Abdurrahman Gok di kêliya qetilkirina Kurkutê ciwan de wêneyên bûyerê kişanibûn lê li gel van belgeyên dîrokî jî daraza tirk polîsên kujer parastin û ji bo wan biryara beraetê da. Polîsên ku ciwanê 22 salî Kemal Kurkut qetil kirin rojekê jî nehatin girtin. Jixwe heman tişt bi salan e li Kurdistanê dubare dibin. Polîs û leşker sîvîlan qetil dikin, hikûmet û daraz kujeran diparêzin û piştre kujer terfî dibin û kujeran tayînî karên bilidtir dikin.

**Ev edaleteke çawa ye?**

Ajansa Mezopotamyayê têkildarî mijarê bi dayika Kemal Kurkut, Sîcan Kurkut re axivî û dayikê li hemberî bêhiqûqiyê wiha bertek nîşan da: "Çima edalet tune ye? Ev edaleteke çawa ye, kesekî ku ciwanekî dikuje serbest tê berdan? Em ê qet û qet vê biryara dadgehê qebûl nekin. Bêsûc û bêguneh lawê min kuştin. Heke sûcekî wî hebe, wî binçav bikin û bigirin. Çavê we kor bibe, ma hûn nabînin? Çima hûn gule berdidinê. Kor bibin."

Dayikê destnîşan kir ku biryareke wiha didin ku rê li ber polîsan vedikin ku karibin gelek ciwanan bikujin û wiha axivî: "Çima li gor dilê xwe û ji kêfî gêncan qetil dikin? Heke wisa dewam bike wê ev kuştin ne ya ne ya dawî be." Dayikê xwest ew tenê neyên hiştin û wiha got: "Berxikê min sêwî bû. Min wî û zarokên xwe yên din di nav feqîriyê de mezin kir. Çawa çê dibe gêncek 22 salî yê bêsûc dikujin û qatil jî ceza nakin."

**Dê şopdarên dozê bin**

Parêzerê malbata Kemal Kurkut, Reyhan Yalçindag der barê biryara beraetê ya polîsê kujer de wiha got: "Bi vê biryarê jî careke din nîşan dan ku wêrekiyê didin kujerên kuştinên ji niha şûn ve pêk werin. Heta em nebêjin qediya dê ev dosya neyê girtin. Heta ev kujer werin cezakirin wê têkoşîna me bidome."

---



## Mirovê herî temendirêj Ehmed Sofî mir

Mirovê herî temendirêj ê cîhanê kurdê bi navê Ehmed Sofî yê ji bajarê Seqiza Rojhilatê Kurdistanê, di 138 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe.

Ajansa Fermî ya Îranê (ÎRNA) kopiya mînakek qeyda nifûsê ya Sofî û nasnameya wî weşand. Li gorî her du belgeyan, Sofî di sedsala 19'an de ji dayik bûye. Bi gotineke din Sofî di 28'ê sibata 1882'yan de ji dayik bûye. Kurdên ji Rojhilat bi temendirêjiya xwe tên nasîn ku gelek ji wan digihêjin 100 saliyê.

Kane Tanaka ya Japon ku weke mirova herî temendirêj a cîhanê dihat nasîn, di 117 saliya xwe de jiyana xwe ji dest da. Rekora temendirêj a cîhanê jî ji Jeanne Calment a Fransayê re hatibû dayîn ku di 122 saliya xwe de jiyana xwe ji dest dabû.

Ehmed Sofî yê ji rojhilatê Kurdistanê, ji mirovên herî temendirêj ên cîhanê gelekî mezintir bû.

Li gorî agahiyên ku di Press TV de hatin dayîn, Sofî ne nexweş bû. Sofiyê ku zarokên wî bi xwe tune bûn, çar zarok jî kiribûn zarok ji xwe re. ***SEQIZ***

## Gelek parêzer hatin binçavkirin

Serdozgeriya Komarê ya Amedê, li dijî Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) lêpirsînek nû da destpêkirin. Di çarçoveya vê lêpirsînê de gelek parêzer, nûner û endamên rêxistinên civakî yên sivîl hatin binçavkirin. Li gorî agahiyên hatin bidestxistin dozgeriyê der barê 101 kesî de biryara binçavkirinê derxistiye. Di vê çarçoveyê de li Amed, Şirnex û Semsûrê polîsan bi ser gelek malan de girt.

Di serdegirtina malan de heta niha 19 jê parêzer bi dehan kes hatine binçavkirin. Kesên hatine binçavkirin birin Midurîyeta Polîsan a Amedê. Li gor agahiyên heta niha em hînbûne navên kesên hatine binçavkirin wiha ne: "Hevserokê Giştî yê Komeleya Hiqûqzanên Ji Bo Azadiyê (OHD) parêzer Bunyamîn Şeker, parêzerên din Abdulkadîr Guleç, Eshat Aktaç, Serdar Talay, Îmran Gokdere, Diyar Çetedîr, Serdar Ozer, Ferîde Laçîn, Gevriye Atli, Resûl Tamûr, Cemîle Tûrhalli Balsak, Ahmet Kalpak, Devrîm Bariş Baran, Neşet Gîrasûn, Sedat Aydîn, Şîvan Cemîl Ozen, Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Samsûrê Prz. Bulent Temel, Mahsum Bati, rêveberê Federasyona Komeleyên Hiqûq û Piştevaniyê ya Malbatên Girtî û Hikumxwaran a Medê (MED TUHAD-FED) Diyar Dîlek Ozer û endama federasyonê Leyla Ayaz, endamê Konseya Navendî ya TTB'ê yê berê Şehmus Gokalp, endamê DÎVES'ê Suleyman Okur, endamê Meclisa Şaredariya Rezanê Panayir Çelîk, rêveberê HDP'ê yê Amedê yê berê Îlhamî Yurek, endamê SES'ê yê hatibû îxraçkirin Ûmît Çetîner, endamê HABERSEN'ê Mehmet Kaçar, Plangerê Bajêr Haknaz Sadak û Edîtora Jinnewsê Roza Metîna, mamosteyê MEDDER'ê Salîh Ongun, rêvebera HDP'a Sûrê ya berê Nîmet Kizgin, nivîskar Mehmet Saît Arzû, Endamê Meclisa HDP'ê Eşref Mamedoglû, rêveberê HDP'a Yenîşehîrê yê berê Şaban Turan, Hevseroka HDP'a Çinarê yê berê Abdulkadîr Dogan, rêveberê HDP'a Çinarê yê berê Feyzî Demîrkiran, rêvebera HDP'a Peyasê Aygul Alagunduz, endama HDP'ê Surbiye Tekgoz û Mele Haci Kaday, Ayşe Ay, Teyfik Karahan, Serhat Aktan, Edîp Yîgît."

Baroya Amedê bertek nîşanî binçavkirinên li Amedê ku piraniya wan parêzer in da û wiha got: "Reforma darazê, bi binçavkirina parêzer û nûnerên rêxistina sivîl dest pê kir."

Berdevka HDP'ê Ebrû Gunay bertek nîşanî operasyona binçavkirinê da û wiha got: "Ev operasyona piştî daxuyaniya reformê ya desthilatdariyê pir manîdar e."***AMED***



---

## Zeytûnên Efrînê tên talankirin

Beriya ku Efrîn were dagirkirin li bajar 18 milyon darên zeytûnê hebûn lê belê piştî dagirkirinê dewleta tirk bi sed hezaran dar birîn yan jî şewitandin. Yên mayî jî ji aliyê dagirkeran ve hatin desteserkirin. Zeytûnên ku hatine desteserkirin li bazarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê tên firotin. Her wiha Tirkiye zeyta ku desteser kiriye di bazara navneteweyî de difroşe. Şîrketeke bi navê 'Kerîm Kurdî' ya li Efrînê bi îstîxbarata tirk re dixebite û zeyta bajêr dişîne Tirkiyeyê. ***EFRÎN***

## Der barê rojnamegeran de doz hat vekirin

Li Mêrdînê ji ber şermezarkirina tayînkirina qeyûm 5 rojnameger jî di nav de bi giştî li 8 kesan doz hat vekirin. Nûçegihanên Ajansa Mezopotamyayê Ahmet Kanbal û Mehmet Şah Orûç, nûçegihana JinNewsê Rojda Aydin, rojnameger Halîme Parlak û Nûrcan Yalçin ku dîmen û wêneyên tundiya polîsan digirtin, hatibûn binçavkirin. Her wiha Mehmet Ete, Hamza Ete û Mehmet Selîm Şîmdî jî hatibûn binçavkirin. Kesên binçavkirî piştî hefteyekê hatibûn berdan. Par biryara neşopandinê hatibû dayîn lê vê carê jî bi îdiaya "Li dijî qanûnê bê çek beşdarî civîn û meşê bûne û tevî hişyarkirinê jî belav nebûne" îdianame hat amade kirin. ***MÊRDÎN***

## Nivîskarê kurd Nezîr Çakan hat girtin

Endamê PEN'a Kurd û rêveberê Komeleya Wêjekarên Kurd nivîskar Nezîr Çakan, di 12'yê mijdarê de li navçeya Erxeniyê ya Amedê di çarçoveya "lêpirsîna Kobanê" de hatibû binçavkirin. Ji ber dosyaya lêpirsînê ku Dozgeriya Enqereyê dabû destpêkirin, polîsan di 13'yê mijdarê de Çakan biribû Enqereyê. Çakan, di 16'ê mijdarê de ji aliyê Dadgeha Cezaya Sûlhê ya 5'emîn a Enqereyê ve hat girtin û wî şandin Girtîgeha Sîncanê ya Enqereyê ya Tîpa L a Hejmara 3'yan. ***AMED***

## Îranê 2 kolberên din qetil kirin

Êrîşên hêzên rejîma Îranê yên li ser kolberan didomin. Hema bêje rojane kolber ji aliyê rejîma Îranê ve tên kuştin. Li gorî nûçeya Komeleya Mafê Mirovan a Kurdistanê, hêzên pasdaran li herêma Şino ya bi ser Ûrmiyeyê ve êrîşî komek kolber kirine. Di encama êrîşê de kolberê bi navê Hakan Mihemed Zade yê xelkê gundê Kirîkan Selmas û kolberê bi navê Wesîm Ferdîn Zade yê xelkê gundê Pirdawê ya Şino hatine kuştin. Tê gotin hîn jî cenazeyê kolberan radestî malbatan nehatiye kirin. Li gorî daneyên rêxistinên mafê mirovan, tenê di meha mijdara 2020'an de 6 kolber ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hatine kuştin û 5 jî birîndar bûne. ***ÛRMIYE***

## TUNDIYA LI JINAN PANDEMIYA ESASÎ YE

# Divê têkoşîn were radîkalîzekirin

Bêrîvan Kayi

*Hişmendiya serdest bi hezaran salan in, bi çewisandin û tepisandinê xwe li ser jinan rewa kiriye û navê jinan ji dîrok, aborî, siyaset, civak û hwd. biriye; jin tenê wek 'kebaniya malê, dayik, xwişk, dergistî, fahîşe...' pênase kiriye. Bi vî awayî jî tenê ne tundiya fizîkî tundiya psikolojik jî lê ferz kiriye. Rojnameger û siyasetmedar Meral Çîçek bi boneya 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Jinan, ji rojnameya me re axivî û behsa tundiya dîrokî ya li jinan û têkoşîna jinan kir.*



Li dijî tesîrên lîberalîzmê, pêdiviya me bi radîkalbûna têkoşîna jinan heye, ji ber ku lîberalîzmê pasîfîzekirina berxwedana jinan ji xwe re kiriye armanc. Di roja me ya îro de tişta hewce ev e ku em têkoşîna xwe radîkalîze bikin

**Tu dikarî qala girîngiya roja 25'ê Mijdara 1960'an û têkoşîna Xwişkên Mîrabelê bikî?**

Ev yek pir girîng e ji bo mirov bizane û ji bîr neke ku Xwişkên Mîrabel 60 sal berê di têkoşîna li hemberî rejîmeke dîktatorekî de hatin kuştin. Lazim e her tim pêwendiyek di navbera 25'ê Mijdarê û faşîzmê de were çêkirin; 60 sal berê jî wisa bû û di roja me ya îro de jî wisa ye. Tê zanîn ku faşîzm rejîmeke li dijî jinan e. Di pratîk û hişmendiya xwe de jî dijminatiya li hember jinan ava dike û em dikarin bêjin ku sîstemeke li dij hemû nirxên jinan e. Li dijî azadî, demokrasî, pirrengînî, aştî, aramî, jiyaneke demokratîk û azad e. Bi kurtasî em dikarin bêjin li dijî jinan faşîzma herî xurt pêk tê. Ji bo vê yekê jî pêwendiya di navbera dîroka 25'ê Mijdara 1960 û ya 2020'an de jî girîng e û hewce ye em vê têkoşîna jinan a li dijî faşîzmê ku ji wê rojê heta roja me ya îro tê bi bîr bînin.

**Di sala 1999'an de ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve jî bo balkişandina tundiya li jinan 25'ê Mijdarê wek Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Jinan a Navneteweyî hat ragihandin. Li Ewropa û gelemperiya cîhanê gelo pêşiya tundiya li jinan çi qas hatiye girtin?**

Pêwîst e em li tundiya li jinan her tim bi aliyên wê yên siyasî, civakî, aborî heta çandî jî binêrin. Ji ber vê jî li gor mercan tundiya li jinan carinan zêde dibe carinan jî kêm dibe. Em di vê mijarê de nikarin qala pêşketineke rasterast bikin. Wekî rêyeke zîqzaqî ye li gorî rastiya civakî û siyasî dimeşe. Wek Ewropa û rojavayê cîhanê helbet rojên wekî 25'ê Mijdarê encama têkoşîneke hevbeş a jinên cîhanê ye. Hewldanek heye hem di nav Neteweyên Yekbûyî de hem jî bi giştî. Ji bo vê yekê jî lazim e em van rojan wek têkoşîna hevbeş a jinên cîhanê bigirin dest. Niha ev têkoşîna ji aliyên NY'ê ve hatî ragihandin çi qas têrker e, helbet di vê mijarê de ne tenê li Ewropa li seranserê cîhanê pirsgirêk heye. Niha lazim e di navbera xebatên têkoşîna hiqûqî û zihnî de hevsengiyek hebe. Bêyî ku zihniyeta civakê were guhertin, tenê bi rêya qanûnan mirov nikare pirsgirêkan çareser bike. Ji bo vê jî dema em li rewşa Ewropayê yan jî rojavayê cîhanê binêrin, helbet di vir de destkeftiyên tevgerên jinan hene lê heke em wek encam lê binêrin jî qirkirina jinan, tundiya li jinan li welatên rojava jî berdewam e û qet jî ne kêm e! Ji kuştina jinan bigirin heta tundiya fizîkî, tacîz û tecawizê, dîsa dema em wek tundiya daîmî lê binêrin dê xuya bibe ku hê jî pirsgirêkeke pir mezin e. Bi taybetî di dema koronayê de xuya bû ku ev zihniyeta zilam ku tundiyê her roj ji nû ve ava dike, pir zêde nehatiye guhertin. Ev yek bi awayekî vekirî li hemû welatan xuya bû. Ji bo vê jî pir girîng e ku mirov li dijî çavkaniya tundiyê têkoşîn bide meşandin. Helbet pêşketin hene, deskeftiyên jinan hene, bes hejmarên tundiya li jinan û hejmarên kuştinên jinan nîşan didin ku hê rêyeke dûr û dirêj li pêşiya me heye.

**Di serî de Rojhilata Navîn li hemû cîhanê nêzîkatiyên baviksalariyê hema bêje di her qadê de her diçe zêdetir dibe. Girêdayî vê yekê zanebûn û berxwedana jinan jî zêde dibe. Sedemên vê yekê çi ne?**

Ez di vê nêrînê de me ku di navbera tundiya li jinan û têkoşîna li hemberî hişmendiya baviksalar de têkiliyek heye. Mesela dema têkoşîna jinan bilind dibe, pergal jî dikeve pozîsyona parastinê û êrîşên xwe yên li jinan zêde dike lê helbet li hember van êrîşên zilamperest jin hîn zêdetir xwedî li têkoşîna azadiyê derdikevin û wê hembêz dikin. Helbet bila ev neyê wê wateyê ku ez tundiya hişmendiya baviksalar normal dibinim an jî wek rewa bi dest digirim! Ji ber ku hişmendiya tundiyê ew hişmendiyeke ku di dîrokê de tim hatiye parastin û heta roja me ya îro jî hebûna xwe li ser kolekirina jinan û înkarkirina mafê jinan bi zextan ava kiriye. Em dizanin ku ev sîstem ji gelek aliyan ve di nav nakokiyan de ye lê belê dema em li nakokiyên esasî binêrin di navbera pergal û lêgerîna azadiya jinan û hebûna jinan de ye. Yanî ne mimkûn e di navbera her du aliyan de aştiyek hebe. Encax jin bi pêşengiya xwe bikaribe vê sîstemê têk bibe. Ji ber vê yekê pergala zilamperest dixwaze qadên xwe yên di encama têkoşîna jinan hatine tengkirin careke din berfireh bike. Di destpêka qonaxa sedsala 21'emîn de ev nakokî ji ber ku zêdetir bûne wateya xwe ya dîrokî zêdetir nîşan dide. Di roja me ya îro de ji ber ku ev nakokî zindî ye firsend bo pêkanîna rizgariya jinê jî zêde ye. Pergal jî dixwaze vê yekê asteng bike, ji ber vê yekê êrîşên li ser jin û civakê zêde dike.

**Te di nivîseke xwe de tundiya li jinan wekî 'diyardeyeke gerdûnî' pênase kiriye. Tu dikarî hinek qala vê mijarê bikî, tundî çima diyardiyeke gerdûnî ye?**

Tundiya li jinan bi gotineke din rasterast pergala gerdûnî ye, yanî pergala baviksalar û kapîtalîst a kurewî xwe herî zêde li ser tundiya li hemberî jinê ava dikin. Di hin mijaran de xwe bi şiklekî veşarî îfade dike lê bi tundiyê rûyê vê pergalê derdikeve holê. Ji ber vê jî pergaleke gerdûnî ye. Niha li seranserê cîhanê cihekî ku pergala tundiyê yan jî ya kapîtalîst xwe negihandiyê tune ye! Ji bilî hin deverên wek girav û kabîleyên li nav daristanan pergala baviksalarî li her deverê xwe ferz kiriye û hişmendiya tundiyê li her deverê heye. Niha em nikarin bêjin ev pirsgirêka welatekî ye û tundî li hin deverên cîhanê kêm-zêde tê kirin. Yanî di roja me ya îro de her cureyê tundiya li jinan rastiyeke gerdûnî îfade dike.

**Niha di sedsala 21'emîn de li her derê cîhanê hem ji aliyê erênî hem jî aliyê neyînî ve têkoşîna jinan di çi astê de ye?**

Têkoşîna rêxistinî ya jinan pir kûr û dirêj nîn e. Rast e 5 hezar sal in jin li dijî zihniyeta baviksalar li ber xwe dide lê îro bi merhaleya pergala modernîteya kapîtalîst gihaşt asteke rêxistinî. Ger em wisa lê binêrin ev 200-300 salên dawî jin zêdetir têkoşîna xwe di çarçoveya qezenckirina mafên siyasî û medenî de kirin. Ji bo ku wek hemwelatî bên qebûlkirin, bibin xwediyê mafên siyasî û medenî hewl dan. Ji sedsala 20'emîn bi şûn de, êdî jin bi xwe rojevên xwe diyar kirin. Em dikarin bibêjin ku jin heta dawiya sedsala 20'emîn bi pêş ketin. Niha di qonaxa 21'emîn de em di çarçoveya navneteweyî de li têkoşîna jinan binêrin, destkeftiyên girîng hene. Niha tişta ku pergala baviksalar bi zanebûn ava kiriye ev e; krîmînalîzekirina mafê parastina jin û gelan e. Bi taybetî netewe- dewletê ji bo dikaribe desthilatdariya xwe li me ferz bike, têkoşîn û berxwedana jinan krîmînalîze kirin. Tundiya li jinan rewa kirin û piştre heman tiştî li ser civakê kirin. Ji ber vê di 10 salên dawî de hişmendiya xweparastinê li nav jinên cîhanê bi pêş ket. Jinên kurd di mijara xweparastinê de roleke girîng lîst.

**Gelo li hemberî hişmendiya serdest rê û rêbazên xweparastinê çi ne?**

Li gor min rê û rêbazên li hemberî xweparastina li dijî hişmendiya serdest rêxistinbûn e. Ji ber ku baweriya min bi çareseriya ferdî tune ye, encax jin hêza xwe ya rêxistinî ava bikin. Wê hingê dê bikaribe rê li ber vê hişmendiyê bigirin û biguherînin. Divê jin bi rêxistinî têbikoşin, ev tune be mirov nikare li hemberî vê hişmendiyê têbikoşe. Berî her tiştî her diçe jin rêxistiniyê qebûl dikin. Teza jinek bi tena serê xwe dikare xwe azad bike, biparêze filan û bêvan ev derewa pergala lîberalîzmê ye. Encax jin birexistinî dikarin çareseriyê peyda bike. Ez wisa difikirim.

**Em dikarin bêjin berxwedana jinên kurd ji bo xweparastinê mînak e?**

Wek pozîsyoneke erênî tevlîbûna jinan di nav pêvajoyên biryargirtinê de wek qada siyaset, civak, di aboriyê de cihgirtin û temsîliyata wê em dikarin bêjin îro di asteke bilind de ye. Mînak jinên kurd di vê mijarê de êdî her diçe dibe xwedî roleke dîrokî; mînaka vê yekê jî şoreşa Rojava ye. Helbet hin pêşketinên paralel ên wek Amerîkaya Latîn jî hene. Pergala hevsrokatiyê êdî ji aliyê gelek welatan ve tê hembêzkirin. Piştî jinên kurd li Swîsreyê partiyek derbasî pergala hevserokatiyê bû. Em êdî di vê qadê de li cîhanê pêşketinên cidî dibînin. Di bîrbirî û hişmendiya heyî de, jin dema rastî tacîz û tecawizê dihatin bêdeng diman û ji ber nêzîkatiyên 'mexdûr sûcdar e' nikaribûn dengê xwe derînin. Ji bo krîmînalîzekirina vê hişmendiyê gelek têkoşîn hat dayîn. Di salên dawî de em dibînin ku jinan ev hişmendiya baviksalariyê îfşa kir. Li gelek welatan ji bo vê yekê li her xwe dan û hê jî didin. Jin xwedî mîsyoneke dîrokî ne û em dikarin bêjin sedsala 21'emîn di destê jinan de ye. Di roja me ya îro de tundiya li jinan, pandemiya esasî ye û hewceye em wisa lê binêrin. Li gorî vê rastiyê jî divê jin stratejiya têkoşîna hevbeş saz bikin.

**Herî dawî tiştek ku tu lê zêde bikî hebe, kerem bike?**

Di roja me de, em dibînin ku sîstema kapîtalîst xwe ji her demê zêdetir bi rêxistin û êrîşên xwe bi rêk û pêk kirine. Bi taybetî di dema pandemiyê de me ev tişt baştir dît ku di navbera pêşketinên li Polonya, Fransa, Amerîka, Filîpîn û hwd. de ji hêla hişmendiya baviksalar ve paraleliyek heye. Ji ber vê, divê her yek ji me bi qasî hişmendiya baviksalar birêxistin be û bi awayekî rêk û pêk vê têkoşînê bidomîne.

Her wiha li dijî tesîra lîberalîzmê pêdiviya me bi radîkalbûna têkoşîna jinan heye. Ji ber ku lîberalîzmê pasîfîzekirina berxwedana jinan ji xwe re kiriye armanc. Îro tişta hewce ye ev e ku em têkoşîna xwe radîkalîze bikin. Di vê mijarê de jinên kurd pêşengiyê dikin û hêzê didin jinên cîhanê. A girîng ew e ku em hişmendiya baviksalar têk bibin û têkoşîna jinan a konfederalîzma demokratîk bi pêş bixin.

## Meral Çîçek kî ye?



Meral Çîçek di sala 1983'yan de li bajarê Koln ê Almanyayê hatiye dinê. Malbata Çîçek ji Meletiyê ye. Li Zanîngeha Frankfurtê beşa siyaset û sosyolojiyê xwendiye. Demeke dirêj li Ewropayê di nav xebatên jinan de cih girtiye û rojnameya Ozgur Polîtîkayê jî di nav de di ragihandinê de kar kiriye. Di sala 2014'an de bi hevalên xwe re li başûrê Kurdistanê Rêxistina Peywendiya Jinên Kurd (Rê-Kurd) ava kir û hê jî serokê vê rêxistinê ye. Her wiha Çîçek endama lijneya kovara Jineolojiyê ye.

# Hincê

**Li gorî rîwayetê mîrekî Herekolê hebûye. Keçeke gelek spehî ya mîr hebûye, Mîr naxwaze keça xwe bizewcîne lê mala wî ji xwazgîniyan xalî nabe, lewre Mîr şertekî giran datîne ber kesên keça wî dixwazin**



Mem Avba

Mîna ku bersiva, 'gelo çima ji navsera çiyayan re dibêjin warê xwedayan?' bide, bi hemû heybeta xwe ve li ser piyan tik sekinîbû Herekola Mîran. Li vî çiyayî demsala havînê êl û eşîr konên xwe yên reş datanîn, zivistanê jî li gundên quntarên wî çiyayî yên mîna ji çîrokan firdayî, dijîn. Gelê wî yê reng û xisleta xwe ji wê girtî, weke wî serberz, destvekirî, dilfireh, camêr û merd; weke axa xwe hişk lê ewqas jî nazik û hestiyar bû. Qewmekî xwedî çandeke dewlemend, welatperwer, ji dostê xwe re dost ji neyarê xwe re xedar...

Xelkê wî, nexasim jî keç û xortên wî li gorî dîroka xwe ya kevnar ku ji kal û pîrên wan diyarî maye, dijiyan û bi erdnîgariya xwe re bibûn yek. Mîna tê gotin, mirov nan û ava kîjan deverê vexwe, dişibe wê deverê. Hem Herekola Mîran bi xelkê xwe şanaz bû, hem xelkê wî bi wî serfiraz û dilşad bû.

Li gorî rîwayetê mîrekî Herekolê hebûye. Keçeke gelek spehî ya mîr hebûye. Dema ku keça Mîr, ango keybanoya wî Hincê tê berê xwe, gelek xwazgîniyên wê çêdibin lê belê Mîr naxwaze keça xwe, delaliya xwe bide mêr. Her ku Mîr dibêje na, xwazgîniyên keçê zêdetir dibin. Êdî wisa dibe ku mala Mîr ji xwazginiyên keça wî xalî nabe. Mîr çi dike nikare pêşî li vê bigire. Bi pêşniyara şêwirmendên xwe herî dawî biryar dide ku şertekî deyne pêşiya xwazgîniyên keça xwe û dibêje: "Kî zivistanekê li navsera Herekolê bimîne, ez ê keça xwe Hincê bidim wî."

Egîd û mêrxas bi hêviya ku dê Hincê ya bi spehiya xwe ve bi nav û deng e bistînin, dikevin ser riya Herekola Mîran, çiyayê serê wan digihîje asîmanan. Her payîzê xortên qeşeng ên ji xwe bawer dikevin ser riya çiyê ku navsera wî ti carî ji berf û boran, ji mij û moranê kêm nabe. Malbatên van xweşmêran, bi hêviya ku dê ji mala mîr re bibin xizm û xinamî zarokên xwe bi kêfxweşî û şahî rê dikin çiyayan.

Mixabin ti kesên payîzê riya çiyê kudandî, diketin ser şiveriyên Herekola Mîran, biharê nazivire. Çavê dê û bav, xizm û malbatê li riya wan diqerime lê ti kes nabe şahid ku kes jê vegeriyaye!

Bi vê rêbazê Mîr, li pêş çavê her kesî ji xwazgînî û daxwazdarên Hincê re nabêje na, rêzdarî û giraniya xwe ya li ba civakê diparêze. Di rastiyê de gelek mêrxas û egîdên delalê ber dilê dê û bavê xwe serî datînin ser riya evîna bêhêvî. Mîr rêyeke wisa dabû pêşiya daxwazdarên evîndar ku jê venegerin!

Dem diborin, demsal tên, sal vedigerin. Êdî hêviya ti kesî namîne. Mîr êdî pê bawer e ku gihiştiye armanca xwe. Dîsa payîz tê, ciwan û mêrxasên dilê wan bi agirê evîna Hincê germ bûyî amadekariyê dikin ku biçin navsera Herekola Mîran û zivistanekê lê derbas bikin û vegerin bên bigihên Hincêya delal.

Di nav refa vê carê de ciwanekî ne ji mala mîr û began ku kes ne li bendê ye heye û daxwazdarê Hincê ye. Çawa be tenê şertekî bavê Hincê, mîrê welatê Herekolê heye, ew jî ew e ku 'kî zivistanekê li navsera Herekolê bijî, dê keça xwe bide wî'.

Evîndarê bibejn û bal, spehî û delaliya Hincê ciwanê bêkes, bê oxirkirin, bêxwedî, bêyî ku li cil û bergê xwe yê pînekirî binêre, dikeve ser riya evîna xwe ya bêmiraz!

Wê zivistanê hema bêje ne li bîra kesî bû ku kesek derketiye çiyê jî. Çawa be ne kurê beg û mîran, ne yê wezîr û kizîran bû. Çawa be gelek mêrxas û babaegîdan xwe ceribandibû lê yek jî nezivirîbû, gelo dê ev sêwiyê hanê dojeha zivistana Herekolê kedî bikira û vegeriya?

Di berbanga biharê de, bêkesê me ji Herekolê dadikeve xwarê. Xelkê ku wî bi saxî li pêşberî xwe dibînin, şaş û metel dibin. Agahî zû belav dibe û her kes dibêje: "Gelo ev çawa dibe? Ewqas mêrxas û egîdên bi nav û deng çûn lê yek nezivirî, vî bêkesî çawa seranserî zivistanê li hemberî bager, bahoz û tofana şewatger li ber xwe da, sax ma?"

Vegera xortê bêkes, hesabên mîr serobino dike. Neçar dimîne ku sozê dayî pêk bîne; keça xwe ya dîtineke wê nedida bi dinyayekê, bide wî! Çawa be soz û bextê mîr qewl û qanûn bû. Carekê gotibû, divê soza xwe pêk bianiya. Berdêla wê sozê, vexwarina tasek jehr bûya jî dê vexwara! Gelê Botanê, ji kesekî ku soza xwe pêk neyne re nedigotin 'mirov' jî.

Kul û kesera mîr ew bû ku ji xwe re digot, 'Ewqas egîdan keça min xwest lê nekarîn bistînin, keça min, ronahiya çavê min, bû nesîbê vî bêkesî? Ev belengaz çawa karîbû ji zivistana Herekolê sax bifilite û vegere?'

Mîr, Herekol û zivistana wê ya xedar baş dizanî. Çawa dibû Herekola bêrehm canê vî bêkesî nestandibû! Zivistana Herekolê, bi çend bejnan berf digirt, bi ba û bager û bahozan, bi şape û aşûtan bêhn li mirovan dadiçikand. Xumexuma li navser, li qelîştek û qefên Herekolê dihat, ji dengê zebaniyên dojehê tirsnaktir bûn. Dengê agirê dojehê jî li ber vê xumîniyê ne titişt bû! Yên derketibûn navsera Herekolê, ji sermayê bêtir, ji deng û xumîniya nediyar ji tirsa miribûn!

Kêrhatî û destbikêriya vî bêkesî ku karîbû vê benda tirsê derbas bike, wêrekiya wî nîn bû bêguman, kerbûna wî ku deng nedibihîstin û agirê evîna wî ya dilê wî germ dikir bibû azweriya serkeftina wî.

Mîr fêm dike ku bawerî ji hêzê xurttir e û ev serkeftina bêkes bi dayîna Hincê xelat dike, wan digihîne mirazê wan. Paşê jî ji bo keça xwe nemir bike, navê wê li gelek zozan, çem, mêrg û warên Botanê datîne.



TABLOYA ŞÊWEKAR ZUHÊR HESÎB



Amed Tîgrîs

## Çîrokên me yên klasîk û pedagojî

Di çanda civat û dewletên paşvemayî de heta van salên dawî ji bo zarokan çîrokxwendin an pirtûkxwendin gelek kêm bûn. Di nav gel de, ne tenê xeberoş, çîrok, fabil û destan hebûn û bi devkî dihatin gotin. Ji wan kesên ku bi devkî çîrokan dibêjin re jî çîrokbêj dibêjin. Wekî dengbêjan piraniya çîrokbêjan jî nexwenda bûn, ji ber dizanibûn.

Di zemanê berê de çîrokbêjan di şevên zivistanên dirêj û tarî de li civatan çîrok digotin. Li bajar û bajarokan jî êvaran li hin mal, qonax û qehwexaneyan çîrokbêjan çîrok vedigotin. Her wiha li gundan jî dê û bavan kal û pîran him ji bo mezinan û hem jî ji bo zarokan çîrokên bi serûven û balkêş vedigotin.

Dema mirov van çîrokan ji aliyê pedagojî û wêjeyî ve binirxîne an li bêjingê bixe, sûd, kar û zerara wan dibîne: ji aliyê kar û sûdê ve çîrok bi kurdî bûn; bi saya wan çîrokan zarok û mezin gelek, peyv, biwêj û gotinên pêşiyan hîn dibûn. Gencîniya peyvên kurdî li gel zarok û mezinan dewlementir dibû. Sîstema vegotinê di serê temaşevanan de çêdibû. Di hinek çîrokan de rengê kurdperweriyê didîtin û hişmediya neteweyî xurt dikirin. Bi van çîrokan bi kurdî hizir, fantazî û xeyala zarokan kûr, xurt û berfireh dibûn. Ev aliyên erênî yên çîrokên klasik bûn. Aliyê neyînî jî hene, gelo ew çi ne? Aliyên neyînî yên van çîrokên kevnare yek jê ev bû ku çîrok ne pedagojîk bû. Li gorî ast û têgehiştina zarokan nebûn, li gorî ast û têgehiştina temenmezinan bûn. Lêbelê zarokên mezin jî li gel temenmezinan guhdarî dikirin. Piran û giraniya mijar û naverokên van çîrokan şer, lêdan, kuştin, girtin, êşkence, tirs û xof bûn. Leheng û fîgurên wan çîrokan dêwê heftserî, hûtê sêserî, pîrebok, cin, reşikê şevê, gurê manco, pelepîxan, qerewêl, gurnepaşê şerûd, ejderhayên dirinde, leşker, polîs, bekçî, doktor... bûn. Li ser navê qehremanî û jêhatîbûnê, leheng mirov û ajalan dikujin û xwezayê tar û mar dikin. Dema çîrokbêjan dest bi çîroka xwe dikirin, zarok ditirsiyan û xwe dikirin bin lihêfê, yên hazir jî bi wan dikeniyan. Dema ku zarokek li malê nerhetî û şûmîtî bikira yan raneketena vê carê dê yan bavê digot, "tu ranekevî ez dê gaziyê dêwê heftserî an gurê manco bikim bila bê te bibe..." Zarok ji tirsan diket bin lehêfê û heta bi xwe de biçûna bêdeng diman. Carnan zarok ji tirsa bi şev bi xwe de dimîztin. Ev ji bo zarokan xeternak in. Divê zarok neyên tirsandin û ji wan re bêjin ku ew çîrok ne rast in, xeyalî ne. An jî ev çîrokên wiha xof li cem zarokan neyên gotin.

Di çîrokên nûjen de wek nimûne karaktereke din dan dêwê heftserî û jê re gotin "Dêwê Dilovan". Dêwê dilovan ji zarok û mirovan re alîkariyê dike. Ev jî ferqa navbera çîroka kevnare û nûjen dide diyarkirin. Zanîn û hunera perwerdeya nûjen a pedagojîk hewqas mezin û girîng e.

Pirtûk û çîrokên zarokan pêwîst e ku li gorî asta temen, bal, daxwaz û zeka zarokan bin. Naverok bi nirxên însanetiyê ve bigunce. Leheng û fîgurên çîrok û nivîsan dilovan, mihrîvan, aştîxwaz û wekhevîparêz bin. Ji xweza, ajal û hemû jîndaran hez bikin. Ziman û ramanên berheman baş û xweş bin. Pirtûk û çîrokên nûjen ên di rojên me de ji bo zarokan tên nivîsandin, divê ev girîngî û taybetiyên pedagojîk bigirin ber çav.

Îro çendek kes hene ku bi kurdî dizanin û haya wan ji psîkolojî û cîhana zarokan a pedagojîk tune, radibin ji bo zarokan çîrokan amade dikin. Ev ji bo zarokan karekî gelek xetere ye. Bi tenê kurdî têr nake ku mirov dest bavêje pênûsê û ji bo zarokan berheman biafrîne.

# Herêma Kurdistanê çima tê cezakirin?

Navenda Nûçeyan

**Rojnamegerê başûrî Rêbaz Hesen der barê mijara budçeya herêma Kurdistanê ya ji aliyê hikûmeta navendî ya Iraqê ve hat qutkirin axivî. Rojnameger Hesen destnîşan kir ku nefta Başûr ketiye destê Tirkiyeyê lê ne haya parlamentoya Başûr û ne jî ya gel ji vê tiştî heye**

Rojeva başûrê Kurdistanê ji nişka ve qulibî ser budçe û mûçeyan. Parlamentoya Iraqê hefta borî biryar da ku heya Herêma Kurdistanê neftê radestî Iraqê neke dê mûçeyên Herêma Kurdistanê neyên şandin. Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî jî diyar kir ku di rojên bê de wê şandeyek ji hikûmeta herêmê serdana Bexdayê bike.



Li gorî hin siysetmedar û rojnamegerên başûrî jî peymana Hikûmeta Herêmê dê 50 salî nefte bifiroşe Tirkiyeyê her ku çûye bûye sedema qeyrana di navbera Bexda û Hewlerê de . Hefteya borî parlamenterê kurd ê li parlamentoya Iraqê Serkewt Şemsedîn derbarê neşandina mûçeya herêmê de destnîşan kir ku hikûmet beriya ku rêya Bexdayê bigire berê xwe daye Enqereyê û ev tişt anîbû ziman: “PDK di qumara bi Tirkiyeyê re nefta Herêma Kurdistanê winda kir.”

Li ser vê bûyera mûçe û têkiliyên di navbera Bexda-Hewlerê de em bi rojnamgerê başûrî Rêbaz Hesen re axivîn. Hesen diyar kir ku PDK hemû neft radestî Tirkiyeyê kiriye û ne haya partiyên di parlamentoyê jê heye ne jî ya gel.

**Bi avakirina herêmê dest pê kir**

Rojnameger Rêbaz Hesen qala dema piştî rejîma Sedam Hisên û avakirina pergala konfederaliyê kir û wiha got: “Babeta mûçeyan babeteke pir aloz û hestiyar e. Babetên qanûnî ne. Piştî rûxandina Sedam Hisên ji sala 2003’yan heta 2005’an lijneyek ji bo destûra bingehîn a Iraqê hat avakirin. Di nav vê lijneyê de nûnerên kurd, ereb (şiî-sinnî), tirkmen, asûr, mesîhî û kildan hebûn. Ji kurdan bêtir nûnerên YNK û PDK’ê hebûn. Piştre propagandaya vê destûrê kirin gotin ev destûr ji bo kurdan baş e, wekî pergaleke konfederalî ye, xweseriya me heye û divê kurd piştgiriyê bidinê. Wê demê rexneyên hin aliyên siyasî ji bo vê destûrê hebûn lê PDK û YNK’ê rexne li ber çavan negirtin gotin ev destûr ji bo kurdan baş e û pergaleke konfederal tîne. Di encamê de ev destûr hat qebûlkirin.”

**Peymana herî dirêj**

Hesen bal kişand ser pêvajoya piştî qebûlkirina destûra hikûmeta navendî ya Iraqê destûra ji bo têkiliyên din daye hikûmeta herêmê lê di meseleya neftê û parastina sînoran de dê di bin kontrola Iraqê de bimîne û ev tişt anî ziman: “PDK li gorî vê destûra bi konsesusa pêkhateyên Iraqê hat danîn tevnegeriya û ev bû sedema krîza mûçeya di navbera hikûmeta herêmî ya Kurdistanê û hikûmeta navendî ya Iraqê. Wekî tê zanîn PDK di sala 2014’an de ji bo 50 salan bi Tirkiyeyê re peymana neftê îmze kir. Li gorî yasayên navdewletî ji bo neftê peyman herî zêde 50 sal dikare bê danîn. Yanî PDK peymana herî dirêj bi Tirkiyeyê re daniye. Li gorî destûra heyî mafê PDK’ê yan jî hêzeke din tune ye bi serê xwe peymanan bi dewletên din re deyne. Ev mafê hikûmeta navendî ya Iraqê ye.”

**‘Haya tu kesî tune ye’**

Rêbaz Hesen di axaftina de xwe de da zanîn ku PDK’ê ne li ser navê hikûmeta herêmê li ser navê xwe ev peymana 50 salan bi Tirkiyeyê re îmze kiriye û wiha domand: “Haya partiyên din ên kurdî yên di parlamentoya herêmê de jê tune ye û nizanin PDK’ê ev peyman li ser kîjan esasan daniye. Tê gotin ku di vê peymanê de xalên leşkerî jî hene. Bi vî awayî beşek herî mezin a başûrê Kurdistanê radestî Tirkiyeyê hatiye kirin. PDK hemû petrol radestî Tirkiyeyê û ji Iraqê jî pere dixwaze. Iraq jî dibêje petrolê radestî min bike em jî mûçeyan bidin. Gelek xalên wekî vê hene lê niha mijara me ne ev e. Ji ber van sedeman hikûmeta Iraqê mûçe li Başûr birî. Xala din, hayê partiyên kurdî yên din ji petrola niha difiroşin Tirkiyeyê tune ye. Hemwelatiyên başûrê Kurdistanê jî nizanin pereyên petrolê û yên ji hikûmeta Iraqê tên girtin çi pê tê kirin, bi ku ve diçe.”

**Iraq dahatan dixwaze**

Rojnameger Hesen di berdewama axaftina xwe de da diyar ku demên dawîn hikûmeta Iraqê di mijara firotina neftê de her çi qas hinekî nerm bûbe jî lê piştre ev yek guheriye û wiha pê de çû: “Rojane 700 hezar bermîl petrol difiroşe Tirkiyeyê. Hikûmeta navendî ji hikûmeta herêmê re got heke hemû nebe jî rojê 350 hezar bermîl bidin me, em ê jî mûçeyên herêmê bidin. Ev çend car in ji bo vê PDK soz dide lê sozê xwe pêk nayne û petrolê nade hikûmeta navendî. Hikûmeta navendî dibêje ne meqûl e ku welatiyekî Besrayê pê qayil bibe pereyê petrola herêma wî bişînin ji bo Başûr. Ji ber vê yekê hikûmeta navendî biryar da ku heta PDK dahata petrol û gumrukê radestî wan neke ew ê jî mûçeyên Başûr nede.”

**Mijar tên berovajîkirin**

Hesen destnîşan kir ku PDK gendelî û nelirêtiyên xwe berovajî dike û mijarê vediguherîne mijareke neteweyî û wiha got: “Dibêje ereb faşîst û şoven in heqê me nadin. Ji kurdan re dibêje lê binêrin Iraq neheqiyê, zilm û zorê li me dike. Bi vî awayî rastiyan vedişêre. Kurdên Başûr êdî dibêjin dema petrol di destê Iraqê de bû, mûçeyên wan dihatin dayîn; jiyan xweştir û baştir bû, krîza aborî tune bû. Di bingeha krîza aborî ya niha de têkiliya PDK’ê ya bi Tirkiyeyê re heye. Ji ber vê yekê li dijî peymanên PDK û Tirkiyeyê ye.”

**‘Tirkiye asteng e’**

Her wiha rojnameger Rêbaz Hesen ragihand ku ji ber siyaseta PDK’ê herêma Kurdistanê tê cezakirin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “PDK hemwelatiyan bi siyaseta xwe ya nebaş ceza dike ji ber ku li gorî destûra federaliyê tevnagere. Heger li gor destûrê tevbigere dê pirsgirêk çareser bibin. Bi taybetî Nêçîrvan Barzanî çi bi petrolê dike kes pê nizane mûçeyên hemwelatiyan nade. Ji ber vê jî hikûmeta Iraqê mûçeyan nade. Di rastiyê de her du jî hemwelatiyan ceza dikin. A rast ew e ku Tirkiye asteng e li ber têkiliyên hikûmeta herêma Kurdistanê û hikûmeta Iraqê. Serokê parlamentoya herêma Kurdistanê yê berê Dr. Yûsif Mihemed gotibû ku petrola başûrê Kurdistanê ne di destê parlamentoya Kurdistanê de, di destê Tirkiyeyê de ye û diyar kiribû ku sedem jî peymana petrolê ya 50 salan a bi Tirkiyeyê re ye.”





Xweşkanî

Felemez Ulug

## Gelê kurd bi hevkariya PDK’ê dizane

Li başûrê Kurdistanê cara yekem e ku partî û rêxistinên kurdî di vê astê de li dijî dagirkerî û êrîşên dewleta tirk dibin xwedî helwest. Êdî hemû aliyên demokratîk û neteweyî di wê baweriyê de ne ku destkeftiyên li herêmê bi berdêlên mezin hatine bidestxistin, bi her awayî muhtacî parastineke bîra neteweyî ne.

Dewleta tirk a dagirker ji bo li herêmê pêşî li yekitiya rêxistin û partiyên kurdî bigire serî li hemû rê û rêbazan dide. Bi taybetî piştî li herêma başûrê Kurdistanê bi cih bû, ji bo şerê li dijî kurdan ji xwe re hevalbendan çêbike kedek mezin da. Di dawiya salên dûrûdirêj de tê dîtin ku li herêmê gihaştiye vê armanca xwe ya qirêj û hevalbendekî baş ji xwe re dîtiye. Ji bo bi alîkariya hevalbendê xwe karibe li qadê liv û tevgara xwe zêde bike êdî destê wê hîn rehet e. Lewma bi çavsoriyeke mezin li herêmê êrîşî destkeftiyên gelê kurd dike.

Êrîşên tifaqa PDK’ê û dewleta tirk a dagirker li dijî destkeftiyên gelê kurd li ser sê herêman tên kirin. Li gor wan ger gelê kurd di van her sê qadan de têk biçe wê êdî nikaribe behsa yekitî û hebûna xwe bike. Lewma ji bo di van qadan de têk neçe çi ji destê wan tê dikin.

Piştî PDK di sala 2014’an de li şengal û Mexmûrê di şerê li dijî DAIŞ’ê de têk çû, li herêmê giraniya xwe bi temamî ji dest da. Bêguman ev ji bo PDK’ê darbeyeke pir giran a stratejî, leşkerî siyasî bû. Rêveberiya PDK’ê êdî baş dizane ku bandora xwe ya li ser civakê jî wenda dike. Ger di demeke nêz de li herêmê pozîsyona xwe xurt neke û dîsa nebe xwedî hêz, dê ne gengaz be ku li ser civakê bibe xwedî bandor. Ji bo vê pêngava PDK’ê ya sereke referandûma Kurdistanê bû. Mixabin ev hemleya PDK’ê ji ber neanalîzkirina rewşa herêmê ya siyasî û leşkerî li gor wê çênebû.

Azadiya Kurdistanê xwestek û hêviya gelê kurd a sedan salan e. Ji ber vê yekê gelê kurd bi rêjeyeke bilind piştgirî da vê referandûmê lê ji ber pêşnedîtina siyasî ya rêvebiriya PDK’ê, ev referandûma ku ji dêvla azadiyê ji kurdan re bîne êş û elemên hîn mezintir bi xwe re anîn. Piştî referandûmê, nîvê axa herêma Kurditanê hat dagirkirin. Rêvebiriya bajarê Kerkûkê ji destê kurdan çû. Bi vê pêvajoyê re baweriya gel êdî mîna berê bi PDK’ê nema.

Lewma rêvebiriya PDK’ê ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî û malbatî ketin nav liv û tevgerê. Di destpêkê de xwestin li herêmê kaosê çêkin û sûdê ji vê rewşê werbigirin lê hişmendiya partiyên kurî yên li herêmê û ya gelê kurd rê li ber girt û ev pêngava PDK’ê jî bi dilê wê nebû.

Piştî wê xwest li Rojava tevliheviyê derbixe, ji bo vê ENKS hazir û nazir bû. Ji ber ENKS li herêmê ne xwedî giraniyeke siyasî û rêxistinî ye di vê pêngava xwe de jî negihaşt armanca xwe. Hemû pêngavên PDK’ê pûç bûn. Hişmendî û zanebûna gelê kurd nehişt ku kes bi îradeya wî bilîze.

Di vê pêvajoyê de hemû partiyên kurdî û aliyên demokratîk ji bo di nav kurdan de yekitiyê saz bikin kedek mezin dan. Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ji bo di nav aliyan de yekitî bi pêş bikeve di her fersendê de banga yekitiya neteweyî kir. KCK bi pêkhatiyên xwe ve piştgiriya xwe ji bo vê pêvajoyê re ragihand lê PDK her tim dûrî vê bangê ma û ji ya xwe daneket.

Bêguman êdî ji aliyê hemû civaka kurd ve tê zanîn ku di mijara yekitiya kurdî de PDK nikare bi îradeya xwe biryarê bide. Ji ber ku PDK li dijî deskeftiyên gelê kurd bi dewleta tirk re di nav hevkariyekê de ye, nikare bi biryara xwe li herêmê tevbigere. Dewleta tirk jî bi qebûlkirina PDK’ê li herêma Kurdistanê xwe bi cih kiriye û li vê herêmê hewl dide kurdan têk bibe.

Hêza rê li ber vê digire û nahêle ku dewlemendiya Kurdistanê ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne di hedefa van hêzan de ye. Gelê kurd êdî rastiyê dibîne û li gor wê dibe xwedî helwest. Dewleta tirk a faşîst ji bo nakokiyên di navbera kurdan de hîn kûrtir bike û bikaribe di nav wan de şerekî derbixe ji Rojava heya Şengalê, ji Şengalê heya Behdînanê li pey fesadî û komployê ye.

Gelê kurd bi hemû lîstikan dizane. Lewma ji serî ve nehat lîstika van hêzen hevkar ên li dijî hebûna kurdan û bû xwedî helwest. Ger PDK di vê hevkariyê de israr bike wê dawî li hebûna xwe bîne. Gelê kurd bi her awayî peyama xwe da, êdî maye dîtina vê peyamê.

# Tedbîrên trajîkomîk



**Piştî zêdebûna pêketiyên koronayê, li Tirkiyeyê tedbîrên trajîkomîk hatin girtin. Yek ji van tedbîran jî qedexeya saetên derketina derve ye**

Navenda Nûçeyan

Bi Kovîd-19'ê ya salek berê ji Çînê belav bû û hemû cîhan xist bin bandora xwe, Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) wek pandemiyê ragihand. Li gorî rêjeyên herî dawî yên hatine parvekirin niha li ser rûyê cîhanê nêzî 56 milyon û 245 hezar kes bi koronayê ketine û nêzî milyonek û 350 hezar kesan jî jiyana xwe ji dest dane. Li gorî serokwezîrê tenduristiyê yê Tirkiriyeyê heta niha 430 hezar kes bi koronayê ketine û 11 hezar û 943 kesan jî jiyana xwe ji dest dane.

Bi demsala payîzê re hejmara pêketiyan roj ji roj zêdetir bûn. Bi vê yekê ve girêdayî jî li tevahiya cîhanê tedbîrên der barê koronayê de berfirehtir bûn. Der barê rewşa Kovîd-19'ê ya dawî û tedbîrên ku li tevahiya cîhanê tên girtin de em bi endamê konseya Yekitiya Bişijkên Tirk (TTB) Dr. Halîs Yerlîkaya re axivîn. Yerlîkaya diyar kir ku li Rojhilata Navîn pêvajoya nexweşiyê ne li gor zanistê lê li gor berjewendiyên rayedaran tên tê birêvebirin.

**Saziyên sivîl bifikar in**

Dr. Halîs Yerlîkaya da zanîn ku daneyên pêketiyên vîrûsa koronayê yên li gelemperiya cîhanê, bi taybetî jî Tirkiyeyê, ji rastiyê dûr in û wiha got: "Hejmara nexweşan ji van daneyan deh caran zêdetir e û ji raya giştî re nayê gotin. Ev hejmar hem li cîhanê jî hem jî li Tirkiyeyê her diçe zêdetir dibe. Ji bo ku temas hê jî di nav civakê de pir e û tedbîrên tên girtin kêm in bi zivistanê re dê zêdetir bibe. Ji bo vê yekê jî em wek saziyên sivîl bifikar in ku ne li Tirkiyeyê ne jî li ser rûyê cîhanê mirov nikare qala kontrolê bike. Wisa xuya dibe ku li her dera cîhanê dê rêje zêdetir bibe."

**Tedbîrên li gor berjewendiyan**

Yerlîkaya bal kişand ser cudahiya tedbîrên di navbera Rojhilata Navîn û rojavayê cîhanê de tên girtin û ev tişt anî ziman: "Li Rojhilata Navîn ev pêvajo ne li gorî zanistê, li gor berjewendiyên rayedar û desthilatan tên girtin. Bi taybetî jî li welatên wek Tirkiyeyê ev pêvajo ne li gorî tenduristiya gel, li gor desthilatê hîn zêdetir çawa xwe xurt bike û bandor li ser aboriyê çênebe, tevdigerin. Rengê polîtîkayên li gorî zanistiyê ne li gorî tenduristiya gel li gorî berjewendiyên aboriyê tevdigerin. Cudahiya herî mezin jî ew e. Ev pêvajo nayê wê wateyê ku tenê li nexweşxaneyan mirov nexweşan derman bike. Hewce ye pêşiya nexweşiyê were girtin ku hejmara nexweşan jî kêm bibe lê em nêzîkatiyeke bi vî rengî di nav tedbîrên Rojhilata Navîn de nabînin. Helbet li rojavayê cîhanê ev kar bi awayekî birêkûpêktir tê meşandin. Ya din jî li rojavayê cîhanê yên vê pêvajoyê didin meşandin û der barê tenduristiyê de biryaran didin saziyên serbixwe ne û rayeder jî li gorî biryarên wan tevdigerin. Tevlîbûna saziyên bijîşkan, saziyên tenduristiyê û sendîkayan a tevlîbûna civakê bixwe jî zêdetir e. Yanî tedbîran ne li gorî serê xwe li gorî zanistê û encamên van saziyan ên zanistî tên girtin. Bi zelalî vê pêvajoyê dimeşînin lê belê li Rojhilata Navîn û bi taybetî li Tirkiyeyê wek desteya şêwirmendiyê ya navendî heye. Ew kesên zanist ne bi serê xwe ne. Tenê wan biryarên ku digirin çiqasî bikêr tên ev yek jî ne diyar e. Li van deran gel tê sûcdarkirin û tewanbarkirin. Dibêjin gel destê xwe neşûştiye û maske nade ber devê xwe û ji bo vê jî hejmar zêde dibe."



**Hin tedbîrên trajîkomîk**

Di axaftina xwe de Yerlîkaya diyar kir ku bi taybetî tedbîrên li Tirkiyeyê tên girtin ne li gorî tenduristî û zanistê, tedbîrên rojane ne û wiha domand: "Bi rastî jî ew tedbîrên ku li Tirkiyeyê tên girtin ne li gorî tenduristiyê ne, rojane tên girtin û ne li gorî zanistiyê ne û her wiha ne li gorî saziyên yekitiya bijîşkan e ku ji bo tenduristiyê li ber xwe didin. Dixwazin di nav civakê de fikra xwedêgiravî vaye em di vê pêvajoyê de baş dimeşin û em serkeftin e belav bikin. Ji ber vê yekê jî gelek tiştên trajîkomîk derdikevin pêşiya me. Wekî li cihê vekirî qedexekirina cixareyê; biryareke wisa dê bandoreke bi çawa bike? Hin biryarên tên girtin sedemên wan çi ne, ji bo çi em nizanin! Mînaka din dibistan li ser kîjan encaman hatin vekirin û careke din li ser kîjan encaman hatin girtin? Em vana nizanin.

Tedbîrên qedexekirina derketina derve ya piştî saet 8'ê êvarê jî pêşî li belavbûna koronayê nagire. Tedbîrên polîtîkayên bi vî rengî bi rastî jî dê serkeftinekê neynin. Serkeftineke di vê mijarê de encax li gorî zanistê û bi tevlîbûna civakê pêkan e. Yanî li gorî daxwazên civakê mirov tevbigere. Ji kesên karker, kesên xizan û kesên debara mala xwe dikin hewce ye piştgiriya aborî û civakî bide wan ku xwe ji nexweşiyê biparêzin."

**'Divê civak xwe biparêze'**

Dr. Halîs Yerlîkaya di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser tedbîrên ku civak xwe bi xwe dikare bigire û wiha got: "Hewce ye gel di warê parastina xwe ya ji nexweşiyê gelek hişyar be. Wek tê xuyakirin, li hemû deverên cîhanê jî desthilatdar li tenduristiya civakan nafikirin. Wê deme jî gere em bixwe li tenduristiya xwe bifikirin. Ev ne tiştekî wisa ye ku mirov piştguh bike. Ev demeke dirêj e, her çi qas şert û mercên debara malê zor û zahmet bin jî hewce ye em tedbîrên xwe bigirin. Kesên nîşaneyên nexweşiyê bi wan re hene, hewce ye tavilê testa xwe bikin. Ji bo nexweşî belav nebe tespîta zûtir pir girîng e. Jixwe xuya ye ku li cîhanê dê di demeke nêz de aşî neyê dîtin. Dema em li Tirkiyeyê dinêrin niha qala dîtina aşiyê tê kirin lê derfetên wê yên ji bo aşiya grîbê hê tune ne. Pêdiviya wê bi 30 milyon doza derman hebû lê tenê milyon û nîvek anîbû. Yanî ji her awayî ve barê xweparastina ji nexweşiyê li ser milê civakê ye û hewce ye her kes piştgirî bide hev û xwe biparêzin."

---



## Waliyê Hewlêrê jiyana xwe ji dest da

Waliyê Hewlerê Firset Sofî 20'ê cotmehê, bi şewba vîrûsa koronayê ketibû û ji wê rojê ve jî li nexweşxaneyeke Tirkiyeyê dihat dermankirin.

Walî Firset Sofî 18'ê mijdarê ji ber nexweşiya koronayê jiyana xwe ji dest da. Dr. Firset Sofî piştî 30 rojan bi pêkitina koronayê, li nexweşxaneyeke Enqereyê ya Tirkiyeyê jiyana xwe ji dest da. Cenazeyê Sofî bi amadebûna berpirsar û serokê herêma Kurdistanê li goristana Şêx Ehmed a li bajarê Hewlêrê hat veşartin.

Dr. Firset Sofî 12'yê îlona 2019'an bûbû waliyê Hewlerê. ***HEWLÊR***

---



Destar

Ehmed Pelda

## Pergala korezanî

Tewna teknolojiyê diguhere, pergala cîvakê jî pê re vedigihure. Erd û xweza, kanî û çavkanî, zeman û zemîn, zanîn û sazûmanî jî diguherin; her wiha danîna têkiliyên cîvakî, çandî û rengê danûstandinê yên polîtîk û rêxistinî jî.

Her wext û zeman bi alav û amûrên xwe, bi navgîn û navbersaziya cudakariyên xwe, reng û rûçikê xwe nîşan dide û derdikeve meydanê. Sed hezar heyf ku ev pêşkêşiya yekta û biheybet ewqasî jî hêsan dernakeve qadan. Her gaveke pêşketinê ya pîşesaziyê, maşîne, alav û amûran li ser milê kedkaran, li ser hişdayîna zanînê, kombûna tecrûbeyên mejûyê dikemile.

Her wiha ne tenê milê hilberîn û xêrûbêr û nirxa hewandî dirûv dide berhemê lê belê bikaranîn, birandin û sûdwergirtina ji wê jî teşeyê dide nirxê berhem û hebûna wê. Kirdeyê kiryaran, serwerê karûbaran, serdarê biryaran û sertacê gotinan ne di gura hev de ne. Ji ber ku her yek xwedî dîwanekê ye, civata danişînê lê ye, rûspî, hoste, pîşesaz, endezyar, hişmend, aqilmend, şêwirmend, hunermend cur bi cur ray û ramanan pêşkêş dikin; bi gotin û vegotinan meseleyan ji hev vediçirînin. Bi kelekela danûstandinan re, bi mercên heyî re teşeyekê didin riya xwe û biryara xwe pêşkêş dikin; dezgehên xwe saz dikin û bi destê karwana xwe bi rê dixin.

Karwan ne yek e, bar ne yek e, rê ne yek e. Xana lê ne ne besî pêlazimiyan e; barê li bendê ne ne têra hemûyan e; riya lê ne ne wek hev e; civata li bendê ne ne li gorî dilan e; bazara lê ne netîjeyî danûstandinan e. Vedigerin, çav didin hev, dest dihavêjin barê hev, çav didin nanê devê hev, zorê didin canê hev. Şêlandin têrê nake, talan dest pê dike. Desteserî têrê nake, wêranî û wêrtasî dest pê dike.

Ew roj ev roj e pergal yek e, navgîn cuda ye; hîş yek e, dîn cuda ye; derd yek e, gotin cuda ye; çare yek e hêvî û daxwazî cuda ye.

Lewma şer gur dibin, zordestî zêde dibin, zengîn zana dibin, hejar neçar dibin, destgeh bilind dibin û xweza perîşan dibe.

Belê heke em yek bi yek serê van her gotinan vekin divê em bi cildan pirtukên dîrok, siyaset, aborî, teknolojî û derûniyê bixwînin, da ku her yek ji hêla xwe ve pariyek ji tiştên pêkhatî girtiye û parek ked jî lê bar kiriye. Mixabin gelek tişt li hev nehatine û ziyanên mezin li ser rûyê erdê pêk hatine. Koka hin cureyên rawer, ajal û sewalan qeliyaye. Hêşînahî, dar û daristan para xwe ya li ser çiya, banî, zozan û deştan winda dikin. Çavkaniyên ava vexwarinê dimiçiqin û şopa wan ziwa dibe. Kanên dewlemendiyên li ser erd û bin erdê dihewînin ji bo pîşesaziyê tên bikaranîn û birandin.

Veçerxandin an jî ji nû ve bikaranîna bermahiyan, ziblê rêkûpêk nîne, her diçe radeya sûdwergirtinê jî kêm dibe.

Ba û bahozên bi hêza bêsînor, şilî, şepelî û şilopeyên bêhesab, ezmanên bi hilma jehrî têrbûyî, deryayên li ber bermahiyên jehrî xitimî û tirbûyî; êdî li dewsa jiyanê, ji mirinê re malovaniyê dikin.

Axirî û encam, şer jî kambaxiyên herî giran in li ser jiyanê, jiyana her tiştî. Jixwe şer kuştin e; kuştina mîrovan, raweran, xwezayê û hemû zindiyan dihewîne. Tenê bi meydana şer ve jî girêdayî nîn e. Şer pereyên ji bo başî û qenciyê bên bîkaranîn desteser dike û dibe sebep ku amûrên kujer, navgînên dijwar û riya mirovên bibin kujer û qetilkar vedike. Bi vî awayî jiyanê jî dorpêç dike û mirovan neçarî şer û hêz, sazî û dezgehên tevna şervaniyê dike. Ev rewş rê û dirbên danûstandinên jiyanî yên cuda, ji navikê ve digire û dixitimîne. Hiş û mêjiyê ku bixwaze giraniya xwe bide ser cureyên jiyanên rengîn, xwe carê bi kilîtên bêziman ve tên zirzekirin û çavên ku çirûskên cuda û rengîn zeft bikin û bixin xizmeta hiş û mêjî ji binî ve tên perdekirin û xêncî qîrûreşiya nexweşiyên nijadperstiyê, rûreşiyên nerindiyan nikarin rengekî azade pêşkêş bikin.

Êdî di kêşeya zemanê me yê îroyîn de, hevsengiyek di navbeyna xweza û şaristaniyê de nemaye. Di vê rewşê de tiştek jî ji xwezayê nayê. Berevajiyê vê, şaristaniya mirovahiyê di nav xetereyê de ye. Xweza xwedî tivdarek e. Qanûnên fizîkê aşkera ne. Heke mirovahî zorê bide ahenga heyî ya xwezayê, xweza serê xwe natewîne. Berevajiyê wê serî radike. Pêlên behrê, ba û bahozên hişk û ziyankar, hilm û hewaya jehrî, qulên ozonê, karvedanên belasebep ên kîmyewî, guherîna rengê sirûştê, zêdebûna pêlên germê û hwd. Hemû jî çavsor in û çavtirsiyê didin şaristaniya mirovan.

Li dewsa ku mirovatî di nav xwe de ahengekê saz bike, pergaleke ku bi xwezayê re di nav hevsengiyekê de bijî saz bike, îhtîmal e ku rewş ber bi başiyê ve biçe. Mixabin aqilmendên cîhanê zorê didin tevna teknolojiyê, li wan wetnê, heke amûrên pêşketî sazbikin, wê bikaribin mîrovahiyê li hemberî wêranî û wêrtasiyên xwezayê biparêzin. Heke nebe jî bar bikin û biçin gersitêrkeke din.

Lewma îro feylesofî jî têk çûye. Entelektûeliya ku him bi zanîna xwe him jî bi liv û tevgera xwe rêberî ji civakê re dikir, niha nemaye. Li dewsa wan zengînên duh rabûne li ser piyan û bûne hûtê zengînên bêsînor. Çendîn bername bi mebesta debara xwe bikin çêkirine, encax lêhatî ye û pê pereyê bêhesab qezenckirine. Îcar xwe li ser me wek zana û rêber neçar dihesibînin. Bi tecrûbeyên xwe ve dixwazin rê li ber mirovahiyê bixin lê gava diaxivin jî ji xêncî çend pabendan tiştekî zêde nizanin û her cara li wan gudarî dikim metirsiya min jî zêde dibe. Roj bê di vî rûpelî de ez ê carcaran bi mînakan ji we re qala van mijaran bikim û agahiyan parve bikim.

# Dîroka hackeriyê û hackerên navdar

Occo Mahabad

**Ji îcadkirina telefon û kompîteran heta roja me ya îro, gelek hacker derketin û bûyerên hackerî çêbûn. Hackerî, carinan bi rûyê sextekariyê, carinan jî bi rûyê siyasî derketiye pêşberî me. Hacker û hackerî rastiyên roja me ya îro ne**

**Hacker (Hekir):** Bi taybetî peyva resen hatiye bikaranîn ku îroniyek çêbibe, ji ber ku wateyên navê hacker pir hene.

**Hackerî çawa dest pê kir ?**

Sal 1878. Şîrketeke telefonê hebû; navê vê şîrketê Bell Telephone bû. Du ciwanên jêhatî diketin xetên telefonan û pê belaş xeber didan. Xelkê ji vî karî re got 'hackirin'. Em dikarin bibêjin ku dîroka hackeriyê wisa dest pê kiriye. Wê demê ev karê hackeriyê wek sûcekî nedihat dîtin; tiştekî zarokane dihat hesibandin. Dîsa jî şîrketên telefonan bi giştî karkerên jin didan xebitandin ku qezenca wan nekeve û kêm nebe. Ji ber ku hê hackerek jin tune bû.

**Dengê kompîterê**

Em werin sala 1960'an. Ji ber ku kompîter hatiye îcadkirin û ketiye jiyana zanîngeh û ciwanan, ciwan vê dahênana (îcad) rojane meraq dikin û dixwazin pê mijûl bibin. Kompîterên vê demê ewqas mezin in ku bi tenê di saziyên fermî û zanîngehan de hene. Mînak, kompîtera ewil li gor gotinan ji tonekê zêdetir e. Ji ber vê jî ji bo kompîterên berê dînazor dihat gotin. Ev dînazor di odeyên mezin de bi saya germahiyê dihatin xebitandin.

Li Amerîkayê di zanîngeha MIT'de (Massachusetts Institute of Technology) hin xwendekar û asîstan ji bo bikaranîneke hêsantir rêbazek dîtin; berê jê re 'kurter' gotin, paşê jî navê wê kirin 'hack'. Bi vî awayî kompîterê kirariyên pêwîst leztir û zûtir dikirin. Di wan salan de, Dennis Ritchie û Ken Thompson pergala xebata UNIX'ê çêdikin. Pergala UNIX'ê ji kurterêyan pêk dihat.

**Gilgil û fiq**

Sal 1971. John Draper keşif kir ku promosyonên Cap'n'Crunch (xwarina gilgilî ye) 2 hezar û 600 mhz deng derdixe ku ev promosyon bi tenê fîqek bû. John bi fîqê li ser awîzeya telefonê pif dikir û heta sibê belaş xeber dida. Draper ev rêbaz di demeke kurt de hînî herkesî dike. Polîs John Drapper digire û jê dipirse "Te çima vî karî kir" Drapper li polîs dinêre û dibêje ku "Min malê xelkê da xelkê".

**Pergala texteyê peyaman**

Sal 1978. Randy Seuss û Ward Christiansen ji bo ragihandin û têkiliyê pergalekê çêdikin. Navê vê pergalê dikin Pergala Texteyê Peyaman (Bulletin Board System ). Êdî hackerên navdar an jî nûgihîştî, hev nas dikirin û bi hev re dixebitiyan. Ev pergal hê jî di roja me ya îro de, ji aliyê hackeran ve tê bikaranîn.

**Kompîtera şexsî**

Sal 1981. Fîrmaya IBM kompîtereke şexsî çêdike û dide nasandin. Ev pêngaveke pir mezin bû û bi "şoreşa teknîkî '' dihate binavkirin. Êdî perê te hebûya te dikaribû kompîterek bikiriya û bi kar biniya. IBM vê salê pereyên pir mezin qezenc dike. Rêveberê IBM'ê wiha digot, "Ev hê lêlê ye em ê loloyê jî bibînin."

Dengê înternetê jî êdî hêdî hêdî dihat. Tora leşkerî ARPANET wê veguheriya bibûya înternet. Destên şîrketan dixuriya wekî gurên birçî, xwe avêtin ser înternetê.

**Koma hackeran: Lejyona Qiyametê**

Sal 1984. Vê salê komeke hackiran tê avakirin. Kom ji aliyê Lex Luthor ve tê avakirin. Navê komê dike Lejyona Qiyametê (Legion Of Doom). Ev kom ji bo hackeran pêngaveke mezin bû. Êdî dema çalakî û xebatên hevpar û rêxistinî hatibû. Ev koma sîberî-online di dema xwe de pir navdar e. Hackerên herî baş di vê rêxistinê de kom dibin, ev jî hikûmeta Amerîkayê ditirsîne.

**Şerê naxweyî**

Piştî salekê di nav Lejyona Qiyametê de şerekî navxweyî derdikeve. Phiber Optik bi hevalê xwe Erik Bloodaxe re şer dike û ji komê tê avêtin. Ev bûyer Lejyona Qiyametê parçe dike. Phiber Optik komeke nû ava dike û navê komê jî dike Masters Of Deception (MOD). Koma MOD xetên telefonan kilîd dikin, xeberdanên hin kesan guhdarî û qeyd dikin, agahiyên şexsî didizin. FBI, Phiber Optik û 4 hevalên wî digire û dixe girtîgehê.

**Zagonên dijwar**


Sal 1985. Dewleta Amerîkayê ji bo astengkirina bûyerên hackeriyê zagonên cur bi cur derdixe. Kongre hefteyek li ser qanûnên nû dixebite. Êdî hackerî tiştek zarokane nedihat dîtin. Yasayên pir dijwar hatin derxistin.

**Vîrûsa Morris**

Sal 1988. Robert Morris bi kurmikên înternetê (internet worm) 6 hezar kompîter hildiweşîne. Dawiyê 10 hezar dolar cezayê pere dide û bi saetan jî di xizmeta civakî de dixebite. Kevin Mitnick dikeve tora şîrketa dîjîtal Equipment Companyê hemû agahiyên şîrketê tevlihev dike û tê girtin ji ber vê salekê di gîrtîgehê de dimîne. Kevin Poulsen dikeve xetên telefonan, piştî 17 mehan ji aliyê FBI'yê ve tê girtin.

**KGB**

Sal 1989. Hackerên ku girêdayî komeleya Chaos Computerê, dikevin pergalên saziyên fermî yên Amerîkayê kod û agahiyên saziyan bi dest dixin û difiroşin KGB'yê. Êdî hackerî bûbû amûreke sîxuriyê. Ev bûyer ji bo operasyona Creduxê bû bingehek. Dewleta Amerîkayê derdiket nêçîra hackeran...



**Operasyona Creduxê**

Sal 1990. Hikûmeta Amerîkayê ji bo girtina hemû hackeran operasyona Creduxêdike. Operasyon li 14 bajaran tê kirin. Gelek hacker tên girtin lê bi vê operasyonê jî encameke teqez nayê bidestxistin. Hackerî mîna nexweşiyekê di nav ciwanan de belav bûbû.

Sal 1994. Vladimir Levin ji bo mafyaya rûsan dixebite û ji kompîterên Citibankê 10 milyon dolar didize. Levin piştî salekê di balafirgeha Heatrowê de tê girtin.

Sal 1995. Kevin Mitnick dîsa tê hepiskirin ji ber ku 20 hezar heb kartên krediyê dizîne. Dadgeh cara ewil hackerekî bi kefaletê serbest bernade. Kevin bi salan di hepsê de dimîne.

**Back Orifice û Trojan**

Sal 1988. Back Orifice ji bo hackirinê bernameyek çêdike û di konferansa The Cult of Death Cowê (DefCon) de dide nasîn. Navê bernameyê Trojan e. Trojan wekî sîxurekî diket pergala kompîterê û dizî dikir. Ji wê salê heta roja me, ev bername ji aliyê hackeran ve tê bikaranîn. Bername cara ewil ji aliyê Ehud Tenebuaum ve tê ceribandin. Ehud dikeve pergalên Pentagonê û kodên leşkerî didize. Ehud bi salan di girtîgehê de dimîne.

**Vîrûsa Melissayê**

Sal 1999. David Smith vîrûsek çêdike û navê evîndara xwe dide bernameyê. Bi vîrûsa Melissayê dikeve pergalên 300 şîrketan û hemû agahiyên wan bi dest dixe û jê dibe. 300 şîrket 400 milyon dolar zirarê dikin. Piştî vê bûyerê Microsoft ji bo astengkirina êrîşan bernameyên parastinê çêdike.

**Vîrûsa eşqê**

Sal 2000. Hackeran bi vîrûsa eşqê pergalên malperên e-Bay, Yahoo û Amazon hildiweşînin. Kodên bernameyên windows û officê ji Microsoftê didizin.

**Cureyên hackeran**

Li gor pisporan 5 cure Hacker hene:

**•Hackerên dibistanî:** Hackerên dibistanî pergala înternetê analîz dikin û hînî naveroka wê dibin. Di kirinên wan de tu carî zerardayîn tune ye. Armanca wan zêdetir zanistî ye.

**•Hackerên jêhatî:** Hackerên jêhatî zerarê didin pergal û malperan. Ew bi hilweşandinê xwe îfade dikin. Li dijî hin tiştan hêrs û nefreta xwe wisa derdixin holê, bi giştî ciwanên nûgihayî ne.

**•Hackerên profesyonel:** Hackerên profesyonel hackirinê bi tenê ji bo pere dikin. Dikevin pergalên sazî û şîrketan, agahiyên wan didizin û difiroşin hin kesên din.

**•Nivîskarên vîrûsan:** Nivîskarên vîrûsan bi kodan vîrûsan çêdikin û wan belavî înternetê dikin.

**•Hackerên siyasî:** Hackerên siyasî bi armanc û hedefên siyasî tevdigerin. Li gor fikr û ramanên xwe çalakiyan dikin.

**Hacker kîjan bername bi kar tînin?**

Hacker bernameyên Trojan (RAT=Remote Access Tools) bi kar tînin. Em dikarin bibêjin ku nêzîkî 300 cureyên wan hene. Ji bo xebitandina Trojanê sê parçe lazim in: Server, Client û Editor. Ev sê parçe saziya Trojanê pêk tînin. Parçeyê Server deriyên pergalê vedike, parçeyê Client bingeha çalakiyê sererast dike, parçeyê Editor çalakiyê pêk tîne. Roja me ya îro, hacker zêdetir Trojanên Bladerunner, Deepthroat, Girlfriend, Schoolbus, Netbus, Subseven, Striker, Doly, Wincrasher, Voodoo û Netsphere bi kar tînin.

**Hin hackerên navdar**

- Adam Beberg: Projeya Cosmê çêkiriye
- Dennis Ritchie &Ken Thompson: Pergala UNIX'ê çêkiriye.
- Dmitry Sklyarov: Taybetiyên şîfrekirina PDF'ê dîtiye.
- Douglas Engelbart: Bernameya Remailerê nivîsandiye û pergala NLS'ê çêkiriye.
- Ian Murphy/Captain Zap: Ketiye pergalên telefonan û belaş xeber daye.
- Johan Helsingus: Bernameya Remailerên Anonîm nivîsandiye.
- Kevin David Mitnick: Di cîhanê de çiqas pergal hene ketiye hundirê wan.
- Kevin Poulsen: Ketiye tora sazî û şîrketan.
- Mark Abene (Phiber Optik): Prensîbên xebitandina telefonan keşf dike.
- Richard Stallman: Bi bernameyên taybet êrîşî kompîteran kiriye.
- Timothy Lloyf: Pergalên şîrketan hilweşandiye.
- Vladimer Lenin: Ji banqeyan agahiyên taybet dizîne.
- Iskorpitx: Hackerekî nijadperest û tirk e. Malper û pergalên çepgir û kurdan hilweşandine. Ji sala 2003 û heta roja me nêzîkî 30 hezar malper hilweşandine. Çi ecêb e ku Iskorpitx hê jî nehatiye girtin!!! Gelo çima? Li gor pisporên ewropayî Iskorpitx komek e...

Li gor lêkolînekê li dinyayê hackerên herî çalak tirk in. Her sal bi hezaran malper û pergalan hildiweşînin. Hackerên tirk pirtir Trojanên Subseven û Netbus bi kar tînin.

**Dawî û encam**

Hin kes hackeran bi lehengên romantîk lê hin kes jî wan bi sextekariyê bi nav dikin. Ji îcadkirina telefon û kompîteran heta roja me ya îro, gelek hacker derketin û bûyerên hackerî çêbûn. Hackerî, carinan bi rûyê sextekariyê, carinan jî bi rûyê siyasî derketiye pêşberî me lê divê em ji bîr nekin ku hacker û hackerî rastiyên roja me ya îro ne; ew ê her tim hebin...

Em ê bi gotineke Aldous Huxley nivîsa xwe biqedînin: ''Hacker bi armancekê tevdigere, hem romantîk e hem zalim e. Hacker dikare bibe şoreşger an jî belengazek.''



## Fîlma War Games

Sal 1983. Hollywood dibîne ku hackerî di nav ciwanan de pir populêr e, fîlmekê dikişîne. Navê fîlm War Games (Lîstikên Şer) bû. Fîlm rekoreke mezin şikand û pir hat temaşekirin. Çêkerê vê fîlmê ewqas pere qezenc kir ku li gotarekê wiha digot: "Me bawer nedikir ku em ê ewqas pere qezenc bikin.'' Rewşa her kesî ne weke sektora fîlmçêkeran bû. Rêveberê wê çaxê yê fîrmaya FORD'ê ji qehran daxuyaniyek dide rojnameya Timesê û dibêje: "Ev eşqa kompîterê karên me kuşt, êdî kes erebeyan nakire."

# Wayîtîya hirê perperikan



Av. Cemile Turhalli



Hirê wayê bi nameyê Patria, Minerva ve Marîa Teresa estbî. Înan rê perperik ameyêne vatene. Nê perperikan dinya de ca nêvedayî ke nêşîyî û nêdîyî. Boya pêroyê dinya arê dayêne û dima ra vila kerdêne, bi no hawa rengê tebîetî viraştêne. Rengînî her ca de bi firayîşê înan virazîyayêne. Nê wayan hem tam û hem zî rih dayêne tebîet. Gandarê tewr sivikî yê dinyaye perperik ê, labelê barê înan hende sivik nîyo. Perperike bi xo nêfirenê û nêgêrenê, perperikî çimê dinya yê. Her çiqas çîmê înan her çî bivînê zî çîyê ke dîyî nêbenê xelasîya înan. Coka ra emrê perperikan kilm o. Sebebêk bîn ê kilmbîyayîşê emrê înan zî oyo ke emrê xo bexşê tebîetî kenê.

Senî ke merdim tewrê tebîetî bî, rengê tebîetî bedelîya. Rengê pêroyê rengan şî û rengînî cayê xo da bêrengînî. Cayê cuyayîşê perperikan bî teng, cayê firayîşê înan kêm bî û boya tebîetî xirab bî. Çiqas şî perperikî zî vindî bîyî. Kesêk nêzano ê semedê çi kêm bîyî, vindî bîyî û şîyî ça.

Wayê Mirabelan ke sembolê 25ê Teşrîna Peyêne ya Roja Têkoşînê Vera Şîdetê Serê Cinîyan ê, tena kewtî perperikan dima. Nê wayan zanayêne ke eke ê perperikanê vindîbîyeyan bivînê, do rengê dinya bixelesîyo. Zanayêne tebîet bi reng û boye pîl beno û eke reng bixelesîyo do rengînî bibo û tebîet kêfweş bibo. Coka ra ê sey perperikan nêvindertêne. Înan waştêne şorê he ca. Vengê xozayî timî goşê înan de bî. Dayîka tebîet çimê xo dabî nê wayan.

Wayê Mirebelan wexto ke gêrayî înan ferq kerd ke perperike wexto ke bena makî demêk ra dima êdî nêeşkena kozaya xo ra vejîya. Kewenê binê ristimanê daran. Vera vera zî baskê înan huşk benê û coka ra nêeşkenê bifirê. Labelê nêrî wina nîyê. Perperikê nêrî wexto ke kozayanê xo ra vejîyenê vernîya kozayanê bînan padanê û nêverdenê perperikê makî kozayan ra bivejîyê û toxuman berî cayanê bînan. Coka ra tebîet de rengînî nêvirazîyeno. Eke tebîet payanê xo ser de nêvindero pîl zî nêbeno.

Vilabîyayîş û vînayîş bi dîyîş dest pêkeno. Tebîet de her gandar bi saya gandarêko bîn ganî beno. Eslê xo de her gandar emr dano gandarêko bîn.

Wayanê Mirabelan zî zanayêne ke merdiman tebîetê perperikan reyde kay kerdo û perperikî vindî kerdî. Vindîbîyayîş bi destê merdiman virazîya. Eke ma bi destê xo no tebîet xira kerdo se ganî ma bi destê xo nê tebîetî ganî bikerî. Coka ra sere de destê xo dayî hemcînsanê xo. Mizgînîya wayîtîye dayo pêroyê cinîyanê dinya. Cinîyan rê vatêne ke eke ê biwazê reyna bifirê ganî sere de sey perperikan kozayanê xo ra bixelisîyê. No zî tena serê xo nêbeno. Înan ke xo kozayan ra xelisna ganî destê xo bidî ê bînan. Vatêne ke xelisîyayîşê ma pêroyan yew o. Ganî cinîyêk daxî binê esaretî de nêmana. Qederê ma pêro cinîyan yew o û girêdayeyê yewbînan o. Eke cinîyêk daxî binê esaretî de bimana o yeno maneya esaretê ma pêro cinîyan.

Wayanê Mirabelan destê xo pêroyê cinîyan rê derg kerd. Waştêne ke pêroyê cinîyî sey perperikan kozayanê xo ra bivejîyî. Goreyê înan tebîetê kozayan zî bi destê nêrî xira bîyo. Coka ra eke tahakkumê nêrî biqedîyo do pêroyê cinîyê dinya bixelisîyê. Xelisîyayîşê kozayan ra tena nîno manaya xelisîyayîşê cinîyan. No seba reng û emrê xozayê zî zaf muhîm o. Zanayêne eke emrê kozayan derg bibo do emrê merdimîye zî derg bibo.

Fikrê wayanê Mirabelan vilayê her ca bî. Çiqas fikrê înan vila bî, cinî hende binê tahakkumê camêrdan ra xilas bî. Wayîtîya cinîyan çiqas şî gird bî labelê dişmenîtî zî hende gird bî. Çimkî zihnîyetê nêrîyî wayanî nêwaştêne.

Nêrîyî hukm awan kerd. Hukm zî zilm viraşt. Keso ke biwazo hukm bikero her çî keno. Hukm her çî şibêneno xo. Bi destê xo her çî vindî kerd. Vindîbîyayîş, bêrengî û bêvengî dinya mehkum kenê. Coka ra gandarî bîyo vindî û tebîet zî xemê kesêk de nîyo.

Hukm nêwazeno kolem bixelisîyo û xelisîyayîşê cinîyan zî nêwazeno. Hukm tena xo û daîmîya xo wazeno.

Wayanê Mirabelan vera zihnîyetê camêrdan de sere wedarit. Destê xo derg kerdî. Hukm û zordarî destê wayan nêtepişt. Seba ke xo tena wazenê Wayanê Mirabelan wayan qetil kerdî. Badê qetilkerdişê wayan perperikê makî ê ke kewtbî binê ristimanê daran werişţî û dormeyê hukm û zordarî pada. Zihnîyetê camêrd mîyanê perperikan de vindî bî.

Qetilkerdişê Wayanê Mirabelan bî werişţiş û serewedartişê pêroyê cinîyan. Wayîtîye bîye pîl. Wayîtîye vilayê her ca bî. Vengê yewnînan berz kerd û resna yewbînan. Gandaran reyna dest da yewbînan. Înan ra dima gandarî û rengînî reyna virazîyaye.

Tebîet bê ganîtî, ganîtî zî bêmakî nêbeno.

## Biciwîyo têkoşînê cinîyan

25ê Teşrîna peyêne roja destpêkerdişê mucadeleyê hirê wayan ê bi nameyê Patria, Minerva û Maria Mirabelan ê vera Cumhurîyetê Domînîkî ya. Mucadeleyê nê wayan ê vera hukmatê dîktatorî yê Rafael Leonidas Trujilloyî bîyo sembolê na roje. 25ê Teşrîna peyên a 1960î de wayê Mirabelî hetê leşkeran ra raştê tecawuzî ameyî û ameyî qetilkerdene. No qetlîyam sey qezayê trafîkî ame nawitene û hêrsê şarî vera nayî zêdîya. Qetilkerdişê wayanê Mirabelî ra dima hukmatê dîktatorîye yê Rafael Trujilloyî zî rijîya. 17ê Kanûna 1999î de Yewîya Miletan 25ê Teşrîna peyêne sey Roja Paştîdayîş û Mucadaleyê Mîyanneteweyîye ya Vera Şidetê Serê Cinîyan îlan kerd.

## Firçeya Şikite

Gulçîn Adar

### 'Cuye weş a'

Mîyanê şert û mercê giranan de gelo ma çiqas eşkenê psîkolojîyê domanê ke derûdorê ma de yê bifikrîyê û xesas têbigeyrê. Şer ra, afatan ra, serebûtê negatîfan ra înan bipawê? Fîlmê, 'cuye weş a' cewabêke baş a semedê pêro pîlan.

Habîl û Kabîl ra heta nika rîyê erdî de şerî her wext bîyê û însanî semedê berjewendîyê xo, pawitişê herra xo, welatê xo mîyanê şer û pêrodayîşan de bîyê. Dinyayêka winasî pîle qîmê însanan nêkerda û hema zî nêkena. Çimeyê ke eke baş bêrê xebitnayene, heta bi heta însanan rê bes ê, la çimvêşanî, bêedaletî beno sebebê alozî û peynîya şeran nîna. Çi beno wa bibo meşrûkerdişî şerî nêbeno çike netîceyê ci texrîbatêk pîl o. Nê texrîbatî ra tewr pîl domanî rî bi rî manenê. Heta nika bi mîlyonan domanî bîyê qurbanê şerî, birîndar bîyê û êyê ke mendê zî bi travmayê giran dir cuya xo dewam kerdê. Xora goreyê ke aseno îdarekarê welatan gonî ra nêbenê mird û do bi no hawa zî peynîya pêrodayîşan nêro o wext lebata ma sey; ma eşkenê senîn çareserîyêk domanan rê bivînê û ma înan tesîrê serebûtan ra muhafeze bikerê bo.

Na babeta ser o zemanêk mi fîlmêk temaşe kerdib. Fîlm de demê nazîyan qalî kerdêne û ez zaf tesîrê ci de mendebîya. Nameyê fîlmî, "Cuye weş a" (Life is beautiful) ez vana qey kesêk temaşe nêkerdo çin o. Fîlm, serra 1997 de ameyo weşankerdene û babeta ci şerê dinya ê diyîne de zulm û tedayê nazîyan ramojneno. Dimayê ke şer virazêno zulmê serê cuhidê îtalyayijan zî zêdyeno û karekter Guîdo bi enerjî û sempatîkîyê xo performansêk baş pêşkêş keno. Fîlm de çîyo ke bale merdimî anceno, mîyanê şerî de têkilîyê pî û domanî yo. Mîyanê hende şerê giran de, serebûtî de, rijnayîşê gonî û tanq û topan de hewldayîşê pîyî oyo ke nê pêro çîyan domanê xo rê sey kay ramojno û bi no hawa zî serkewte beno. Heta peynî doman vano qey mîyanê kayêk de yo. Beno ke xeylê kesî vajê ancax no fîlman de bo, la mesajo esas oyo ke mîyanê serebûtan de hîsgêrîyê pîlan ê hemverê domanan o. Çi heyf no zaf yeno peygoşkerdene.



# Vengdayîşê 25ê Teşrîna Peyêne: Biciwîyo têkoşînê cinîyan

Cinî hadreyîya 25ê Teşrîna Peyêne kenê ke biherikê raşteyan. Cinîyan dîyar kerdê ke ê paweyê pêroyê cinîyanê ke raşteyan de pîya vera şîdetî de biqîrê û wina vatî: "Wa ena roje biba hewn ra werişţişê vera şîdetî. Biciwîyo têkoşînê cinîyan."

25ê Teşrîna peyêne de mucadeleyê hîrê wayan ê bi nameyê Patria, Minerva û Maria Mirabelan ê vera Cumhurîyetê Domînîkî dest pêkerd. Wayanê Mirabelan vera hukmatê dîktatorî yê Rafael Leonidas Trujilloyî de sere wedaritî. 25ê Teşrîna Peyêna 1960î de wayê Mirabelî raştê tecawuzî ameyî û dima ra ameyî qetilkerdene. Hedîse sey qezayê trafîkî ame nawitene. Qetilkerdişê wayan ra dima hukmatê dîktatorîye yê Rafael Trujilloyî rijîya û 17ê Kanûna 1999î de Yewîya Miletan 25ê Teşrîna Peyêne sey Teşrîna Peyêne ya Roja Têkoşînê Vera Şîdetê Serê Cinîyan îlan kerd. Nizdîbîyayîşê serrgêra qetilkerdişê nê wayan de cinî hadreyîya 25ê Teşrîna Peyêne kenê ke biherikê raşteyan. Cinîyan dîyar kerdê ke ê paweyê pêroyê cinîyan ke raşteyan de pîya biqîrê û vengê tewrbîyayîşî kerdî.



**'Cinî awankerdoxê komelî yî'**

Sereka Komîsyonê Cinîyan ya Federasyonê Komelê Herêmî yê Kizilirmakî Ayten Gursoye qiseykerdişê xo de bale ante muhîmîya 25ê Teşrîna Peyêne ser û va: "Ma veng danê pêroyê cinîyan ke 25ê Teşrîna Peyêne de biherikîyê raşteyan. Cinî awankerdox û rayîrberê komelî yî. Wa cinî biherikî raşteyan ke nîşan bidî hêzê ma esto ke ma bedilnayîşan bikerî."

**'Wa ewro roja rawuştene bo'**

Salime Tarikçi dîyar kerde ke ê veng danî pêro cinî rawirzê û wina va: "Ma dinayayêke wişk, wehşî, wêranker, tecawuzkar de ciwîyenê. Ganî ma mîyanê paştdayîşî de bê. Paştdayîş merdimî dano ciwîyayîş. La ganî ma mîyanê paştdayîş de ganî ma rawuşte bê. Ganî hemverê şîdetî ma pîya bê. Ma sey tevgerê cinîyan xeylê çî kerdî. Ma şewe roje û kuçeyan waştî. Ma nêwaşt ma keye de bi tena sereyê xo bimanî. Keye, halînêko la ayenî wextî de tecrîd o. Eke ma tena bimanê, ma do tewr zêde bidejê. Teberê keyan de zî ciwîyayîş esto. Ma hem kuçeyan hem zî şewan wazenê."

**'Wa biciwîyo têkoşînê cinîyan'**

Endama Meclîsê Cinîyan ya Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) Lemane Kîraz zî dîyar kerd ke 60yin serrgera qetilkerdene Wayê Mîrabel de pêro cinî wareyan de yê û va: "Ma seba ke vajê şîdetê dewlete wa vindero, seba ke ma azadîya xo bidest bikerê, seba ke ma hemverê şîdet û bêkarî vinderê ma vanê wa pêro cinî vejîyê wareyan. Ma cinî pîya bi hêz ê. Biciwîyo têkoşînê cinîyan." ***ANQARA***




## Şûjin

Dildarê Amedê

### Keyso

Gêjo: Tu zanî di dinyayê de kîjan meya herî xweş e?

Keyso: Bi xwedê ya herî xweş ew e, ya ji kîsê yekî din vedixwim.

Gêjo: Malmîrat welehî tu goreke vala jî bibînî tu yê xwe biavêjî gorê ji ber ku belaş e.

Keyso: Dikim û nakim tiştê ku pereyê xwe tê didim di ber min re naçe xwarê. Mîrat naçe xwarê ha, ma bi destê min e.

### Terbiya rast

Bav ji kurê xwe re got: Lawo tu bi qurbana lawê xwe bibî. Binêre, misîn di destê wî de ye, destmêj
digire lê tu li halê xwe binêre tu çi dikî. Yê te şûşeya jehra te li ber te ye, tu zeqnebûtê vedixwî.

Law ji bavê xwe re got: Ha ha bavo, ev jî tê wateyê ku terbiya bav gelekî girîng e. Ez terbiya te me, de ka li terbiya xwe binêre.

Yê misîn jî di destan de kurê min e, ew jî terbiya min e.

Îca te dît bavo ka li terbiya xwe binêre û li ya min binêre.

### Zewac

Ciwanekî xwest dudiliya xwe ya ji bo zewacê zelal bike.

Rabû çû ba filozofekî û ev pirs jê kir: Ma tu çi şîretê li min dikî, ez
bizewicim an nezewicim?

Fîlozof jê re got: Tu bizewicî jî tu
nezewicî jî di tu yê poşman bibî.

# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanokên (mamik) xweş amade kirin. Em bi hêvî ne ku li gorî dilê we bin. Bi malbatî dîsa van tiştanokan ji hev bipirsin û tasekê ji kaniya da û dapîran, bav û bapîran vexwin. Tiştanok bi gotina 'kî dizane ev çi ye' yan bi gotina 'mamê mino mamanî' dest pê dike.

**1-** Bav ciwan kur rûspî
kî dizane ev çi ye?

**2-** Mamê mino mamanî
Bê serî û bê ling
Diherike li bajar û gund

**3-** Mamê mino mamanî
Bejna wê bejna bûkan
Hêkên wê hêkên çûkan

***Çavkanî: Mamikên Botanê ji berhevkariya Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**

**1-** Pempo
**2-** Çem
**3-** Çifte , tiving

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de, çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re par vebikin.
De werim em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Ez im ez**
**bavê felemez**
**xwediyê kerîkî pez**
**bi şev û ro lez û bez**


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Ezîzê kurê evdilezîz**
**Bavê ezîzeya Elezîzî me**

→ Heke ew jî nebû dê ev bibe:
**Ez kuncî**
**Tu kuncî**
**Li ser kevirê narincî**

***Çavkanî: Pitrûka Zûgotinokan a ji berhevkariya Mihemedê Kurdo***



# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Ne hişk 3. Ol 5. Dareke çiyayên Kurdistanê ku fêkiyê wê tal û biqaşil e
6. Serobino, bermeqlûb 7. Qenc, çê, pak 9. Gundor
12. Mirovê derewîn û her gavê rûyê xwe diguherîne 14. Cejin
15. Xwe xewlekirin, bi tenê man 17. Qirika ziwa, hewcedariya bi vexwarina avê
18. Reşahiya mirov û tiştan a li ber tavê çêdibe
22. Hesinê gemar girtiye, zeriya li ser hesin

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Roj 2. Navekî keçan
3. Dixan, dûman
4. Bersiva neyênî
5. Derya 7. Xweşikbûn
8. Vexwarineke ku ji sewalên wekî mî û çêlekan tê bidestxistin
10. Arvan 11. Heskirin, eşq
13. Li bakurê Kurdistanê li şûna gelê rûsî, rûsiyan tê gotin
14. Rawestgeh, sazî û dezgeha weşanên dengî 16. Nikê riman ê tûj
19. Vê carê, vê neqlê
20. Kurt, ne dirêj
21. Cînavê pirsiyariya kesane
23. Vexwarina sereke ya mirov û zindîweran

Bersiva hefteya borî

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 B | Î | 2 R | | | | | | 3 M | Î | 4 R | |
| E | | A | | | 5 S | A | F | Î | | Û | |
| 6 Ş | E | W | B | | Ê | | | | | | |
| | | Ê | | | W | | 7 Ş | A | 8 R | | |
| 9 B | 10 A | J | A | 11 R | Î | | E | | E | | |
| | R | | | O | | | 12 R | A | V | 13 A | |
| 14 Î | D | | | V | | | V | | | G | |
| B | | | 15 K | Î | 16 N | D | A | R | | I | |
| 17 A | V | | | | A | | N | | | 18 R | 19 E |
| D | | | 20 G | | M | | | 21 O | | | R |
| E | | 22 H | E | R | E | 23 K | O | L | | | D |
| T | | | R | | | Î | | | | | |

Li dijî tundiya mêr-dewletê

# EM TÊDIKOŞIN!

## EM Ê BI SER BIKEVIN, DÊ FERASETA ÊRIŞKAR TÊK BIÇE!

### Di 25'ê Mijdarê, Roja Têkoşîna Navneteweyî ya Tundkariya Li Dijî Jinan de em bang li hemû jinan dikin: Werin em kolanan bi rengên jinan bixemilînin û hêz bidin têkoşîna maf û azadiya jinê.

Hikûmet bi siyaseta xwe ya li ser jinan, roj bi roj qadên jiyanî yên jinan tune dike. Jin rastî her cure zext û qedexeyan tên, kiryar bêceza dimînin.

Êrişên li hemberî jinan parçeyeke polîtîkaya desthilatdariyê ye. Sedema kuştina jinan, êriş û destdirêjiya li hemberî jinan polîtîkayên hikûmetê bi xwe ne. Jin vê êrişkariyê, desthilatdariyê, feraseta mêr û dewletê qebûl nakin. Jin bi hêz in û pêşengên şoreşa civakî ne!

Li hemberî polîtîkayên desthilatdariyê;
Li hemberî talana xweza û bajaran;
Li hemberî êrişên li ser îradeya me, zimanê dayikê;

**Em serî natewînin!**
**Em xwe diparêzin!**
**Em têkoşînê bilind dikin!**



xwebûn

23-29 Mijdar 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 49

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli

***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Lêkolînên zanistî pîvana paradîgmaya nû diyar dikin

Serhad Kaya

*Cudahiya di navbera goştxwirî û giyaxwiriyê de dibe ku wek pêdiviya xeleka jiyanê were dîtin: dibe ku hin kes bêjin ji bo jiyana ajalan pêdivî bi giya, ji bo jiyana mirovan jî pêdivî bi ajalan heye. Di vê de li şûna peyva 'pêdivî heye', 'hatiye afirandin' were danîn wê were fêmkirin ku ev fikir ne fikreke zanistî ye lê fikreke olî/mebestî ye. Ji bo fêmkirina rastiya wê jî pirsa 'giya ji bo xwarina ajalan, ajal ji bo xwarina mirovan hatibe afirandin (nexweşiyên wek cuzzam, pençeşêr bînin bîra xwe) qey bakterî û vîrûs jî ji bo xwarina mirovan hatine afirandin? Kirin bes e. (A. Şenel)*

Di kolanên arkeolojîk de bi gelemperî ji bermahiyên ji kevir û hestiyan tê gotin ku nêçîrvaniyê bandor li jiyana mirovan kiriye. Ev bûye sedema nêrîna yekalî ya li dîrokê. Hat fêmkirin ku yek ji sedemên bingehîn ên serdestiya nêçîrvaniyê heya îro ji ber vê nêrîna yekalî ye. Ji ber vê çendê heger şert û mercên serdemê li ber çavan bên girtin, dikare bê gotin ku kevir û hestî bi hêsanî dihatin veşartin lê ne rast e ku mirov heman tiştî ji bo nebatan jî bibêje.

**Lêkolînên zanistî**

Di deh salên dawî de hate dîtin ku li gorî lêkolînên zanistî, fosîlên mîkroskobîk ên nebatan ji holê ranebûne. Li ser vê bingehê, zanyaran karibûn li ser alav, hestî û diranên mirovên girêdayî serdema kevirîn lêkolîn bikin. Bi vê rêbazê, hate kifşkirin ku mirovên berê bi piranî nebat dixwarin. Sedema vê yekê jî ew e ku mirov li gor anatomî û fîzyolojiya xwe ne xwedan geneke taybet e ku goşt bixwin. Di vî warî de, dikare bê gotin ku mirov adepteyî xwarina nebatî ne.

Ji bo vê yekê mînaka çêtir dê lêkolînên li ser hestiyên 68 gladyatoran bin ku li goristana gladyatorên Efesê hatine dîtin. Di van lêkolînan de, li ser zêdeyî 5 hezar hestî lêkolîn hatine kirin. Li ser beşa xaçê ya hestiyan kûrahiyek mezin a mîneralên hestiyan heye. Bi gotineke din, hate aşkerakirin ku ji bo masûlk û hestiyên xurt gladyatorên xwedan xebatek giran û parêzek baş in. Ji ber vê parêzê, hate diyarkirin ku ji gladyatoran re Hardearii digotin, ji ber ku fasûlî û ce dixwarin.

**Şaşiya dîrokî**

Xeletiya enerjîdana goşt ji hêla kîmyagerê alman Liebig ve di salên 1800'î de hate danîn. Liebig got ku enerjiya masûlkeyan ji proteîna ajalan tê û vejeteryan nikarin demek dirêj werzîşê bikin. Gotina ji bo proteînê ya kîmyagerê Alman, li gelek kesan bandor kir, DYA jî tê de. Teoriya wî bi vedîtina masûlkeyên bi karbonhîdratên ji nebatan tên dixebitin, tê têr kirin, hilweşiya. Heya wê hingê, ramanên Liebig cîhan dorpêç kiribû. Gava ku werzîşvanên nebatî di 1908'an de medalyeyên zêrîn ên olîmpîk wergirtin, bernameyên parêzê yên nebatî populer bûn.

Dikare were gotin ku nêçîrvaniya kûrbûyî Leviathanek welidand û ev Leviathan bû sedema 3 şerên mezin ên cîhanî û mirina bi milyonan mirovên ku rasterast bi nêçîrvaniya kûrbûyî (kuştin, gulebarankirin) re têkildar in. Heta ku anarşîst, femînîst, sosyalîst, komunîst, demokrat û hwd yên îro li cîhanê li ber xwe didin, piştgiriyê nedin çalakiyên mafdar ên vejeteryan û veganan dê hilberîna desthilatdariyê û şer bidomin.

**Nêçîrvanî paşê tê kirin**

Ji hêla zanyaran ve hatiye destnîşankirin ku yekem çavkaniya xwarinê ya mirovên prîmîtîve (seretayî) berhevkarî ye. Bi demê re, mirovên seretayî ji bermahiyên heywanên ku ji hêla heywanên kovî ve (tene ji sedî 2'yê xwezayê digirin) tên nêçîrkirin dest pê kirine. Ev çavkaniya xwarinê di lîteraturê de wekî leşxwariyêr tê binavkirin. Bi demê re, hin kesan bi teqlîdkirina van ajalên kovî dest bi nêçîrvaniyê kirin. Bi gotineke din, nêçîrvanî gelek paşê wek çavkaniyeke xwarinê derketiye holê. Şaşiyeke wiha heye ku termînolojiya heyî aşkera dike dibêje bêyî nêçîrê jiyanek çênabe. Di vî warî de, dikare bi hêsanî were gotin ku dîroka şaristaniyê bi nêçîrvaniyê xwe tecrûbe kiriye. Ji ber vê çendê ye, di zimanên hind-ewropî de peydabûna têgeha lîstok (lîstik) ji têgeha lêxistin, lêxistok (lêdan) jî berhemeke kûrbûna vê şaşiyê ye.

**Vîtamîna C**


Li gorî goştxwiran, ji bo hezmê qenaleke me ya dirêj heye. Di vî warî de, mirov dikare nebatên dirêjtir bimehîne. Em nikarin vîtamîna C'yê jî hilberînin. Vîtamîna C jî di nebatan de heye. Ev nîşan dide ku jixwe nekariya hilberînî jiyana me çi qas bi nebatan ve girêdide. Ji ber vê yekê mirov nêrîna trikromatîk (dîtiniya rengîn) heye. Berevajiyê vê goştxwir xwedî nêrîneke dîkromatîk (du-reng) in. Rastiya ku mirov bêtir rengan dibînin nîşan dide ku pêdivî bi dîtina fêkiyên nû û ciwan heye.

*"Em dizanin ku di bin rêberiya zanistê de, bav û kalên mirovên yekem ji Afrîkaya navîn koçî bakur û rojhilat bûne û hatine Mezopotamyayê. Her weha zanyar dibêjin ku genimê îroyîn bi çil û çar kromozom ji pêkvebûna gihayê genimê kovî û gihayê bizinê çêbûye. Heya wê rojê, bav-dêya mirov giya dixwar. Wan dest bi xwarina giyayê genim kirin ku ew celebek giya ye û bûye parçeyek ji jiyana wan. Dê-bavên mirovî bi organên mêjî û cerebellum ên bi vê xwarinê bi pêş ve diçin û mezin dibin ji serdema zarokatiyê xelas dibin. Pêvajoya mezinbûnê hîn jî li ser riya pêşveçûnê ye. Her ku hişê mirov bi pêş dikeve, hest jî bi pêş dikevin. Rêxistinkirin û watedarkirina wan bi wextê ve her tim dewam kiriye û vê dewam bike. Bi çêbûn û pêşketina hesta dilsoziyê, îro li Mezopotamyayê rîtûela "maçkirina nanê ketî û danîna ser serê xwe" ve berdewam dike. Em hem bi dilsozî û hem jî bi spasiya xwe ve girêdayî nanê ku me radike ser piyan û li ser xwe disekinîne." (H. Mem, Tesewira Xaniyê Fîlozof, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê)*

Gotara jêrîn dê di warê glîkoza karbohîdartan û çêbûna mêjî de pir bikêrhatî be. Wekî mînak, di 100 gram arvanê genim de, 13,6 gram proteîn, 2,5 gram rûn, 69,1 gram karbobhîdrat heye û 339 kalorî. (R. A. McCance û E. M. Widdowson, The Compasifianof Foodllan (ji 1960'an) AnaBritannica (çapa 1986) "Nutrition" nivîsar, (jê wergirtin; Alaeddin Şenel).

Dema ku em li vegotina etîmolojîk a karbonhîdratê ku yek ji mijarên sereke yên xwarina werzîşkaran e, dinêrin em dibînin ku ew ji peyva 'chenm' tê û ev peyv di zimanên hind-ewropî de (koma zimanên Aryen), wek mînak bi kurdî bi wateya 'genim' e û gelek nêzîkê hev in.

***Çavkanî:***
***H. Mem, Tesewira Xaniyê Fîlozof, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê***
***Aleaddin Şenel, Dîroka Mirovahiyê-Însanlik Tarîhî***






Helîm Barîn

## Rewşenbîrî

Tiştên ku li welatên din ji 100 salan carekê diqewimin, li kurdistanê di salekê de diqewimin. Hîn me yê li ser yekitiya neteweyî nîqaşan bikira, ha me dît nîqaşa birakujiyê dest pê kir û birayê bû 5 sal berê li dora heman maseyê bo yekitiyê rûniştibûn, niha bi îdiaya 'nerewabûn'ê hewl dide birayê xwe ber bi dijmin ve def bide. Mirov ji şerma nizane çi bibêje! Yekitî hêjayî nîqaşê bû lê birakujî zelal e; xêr jê tune ye. Tam min ê bigota kes nikare vê biparêze, hin kesan hewl da birakujiyê biparêzin û bi navê rewşenbîriyê! Bi daxuyaniyekê bi kurtasî gotin "bijî birakujî" û bûn qeşmer û pêkenîn li ser torên medyay civakî. Li ser navê zanistê profesorên kelbox ne bes bûn ku di kanalîsazyonên tirkan de bi şev û roj çêrê kurdan dikin, niha jî "rewşenbîrên kurd" dest bi kar kirine ku kurd şerê hevdu bikin û xwîna hevdu birijînin.

Qet nebe bila ev daxuyaniya nebixêr bibe sedama nîqaşên li ser rewşenbîriyê da ku em henekî teselî bibin. Li ser meselê, li Kurdistanê em ê ji kê re bibêjin 'rewşenbîr' û li mêtingehan rewşenbîr kî ne? Ji bo destpêkê em çend gotinan bibêjin...

Li gorî M. Foucault'î, piştî gotara Kant a li ser rewşenbîriyê, ev 200 sal in filozofiya modern a ewropî li dû vê bersivê ye. Kant rewşenbîriyê bi xelasiya ji xavîtiyê şîrove dikir û digot 'sapare aude' yanî 'biwêre-aqilê xwe bişixulîne'. Her çi qas ev gotin bi me xweş were jî Foucault gotara Kantî ji gelek hêlan ve rexne dike. Ji ber ku Kant dibêje aqilê xwe bişixulîne lê li gorî zagonan tev bigere. Yanî di ramînê de azadî lê zagon çi bin ew e! Li gorî Kantî heger tu li derveyî zagonan tevnegerî heya dawî dikarî bifikirî...

Rewşenbîriya ku Kant behs dike ev e: Divê mirov bi mantiqa zagonan baş bizanibe û xwe tev li van zagonan bike. Li ser meselê, ger tu bacê bidî divê tu bizanibî tu yê çi qasî bidî û çima didî lê tu yê dawiya dawî bidî. Foucault vê yekê di navebera despotîzma rasyonel û aqilê xweser de wekî peymanek dibîne û li gorî wî ji bo îteatkarî ev rêbaza herî ewle ye.

Netewe-dewlet xwe li ser vê peymanê ava ava dikin. Mînaka ku li jorê me behs kir tam jî ev e. Bi rêya reşwenbîriyê di navbera despotîzma mêtingeriyê û gel de îteat tê hilberandin. Ji azadiya welêt bêtir behsa zagonan tê kirin. Foucault rewşenbîriye wiha pênase dike: Kesên zanîn û pisporiya xwe û têkiliyên xwe yên bi heqîqetê re ji bo tekoşîna polîtîk bi kar tînin, rewşenbîr in. Li vir peyva girîng tekoşîn e, rewşenbîr têdikoşin, xwe nakin berdevkên desthilatiyê û gel qanih nakin bo tênekoşin. Ma li kurdistanê mînakên rewşenbîran tune ne?

Apê Musayê ku qelama xwe kir şûr û pê şer kir rewşenbîr e; Mihemed Şexoyê ku got nabe li şûna Kurdistanê bibêjim gulistan rewşenbîr e; Ebdila Peşêwê ku helbesta xwe kir helwest û li hemberî birakujiyê dengê xwe bilind kir rewşenbîr e; Mizgîna ku dengê xwe tev li tekoşîna azadiya welêt kir rewşenbîr e; Ehmed Huseynîyê ku tavilê vegeriya welêt û helbestên xwe li çeperan bo şervanên azadiyê xwend rewşenbîr e; Xelîl Daxê ku çiya ji xwe û kameraya xwe re kir stargeh rewşenbîr e; Tahir Elçiyê ku bo aştiyê hişyar û bang dikir rewşenbîr e; Rênas Jiyanê ku Dayika Taybet a bi rojan laşên wê li rasta erdê ma di nav helbesta xwe da veşart rewşenbîr e; Ciwan Hacoyê ku rahişt megafonê û li dijî dagirkeriya welêt gelê xwe hişyar kir rewşenbîr e...

**Antîvîrûsa birakujiyê yekitî ye**

Ger aliyên sîyasî ji rojeva xwe yekitiyê derxistibin ev nayê wê maneyê ku girîngiya yekitiyê namîne. Mijara yekitiyê wek ku em bibêjin "em ji hev hez dikin" nîn e. Aliyên kurdan ne mecbûr in ji hev hez bikin lê ger xema azadiya gelê kurd bi wan re hebe mecbûr in ku yekitiya gelê kurd saz bikin.

Her çi qas koka têgeha yekitiyê ji "yek"ê be jî wateya wê, li ser rêgeza azadiya neteweyî, kombûna komên cur bi cur e. Rihê yekitiyê rihekî demokratîk e û ti kom nikare bernameyên xwe yên siyasî û berjewendiyên xwe li ser komên din ferz bike. Divê civak bi aşkerayî û zelal pîvanên yekitiyê bizanibe ku bikaribe komên ku li gor pîvanên yekitiyê tevnagere hişyar bike. Ji ber wê jî divê rêzikname yan jî manîfestoya yekitiyê bê nivîsandin. Bêrêgez yekitî ne pêkan e. Niyeta baş lazim e lê bi niyeta baş jî yekitî saz nabe.

Yekitî kategoriyeke huqûqî ye. Her alî ji yekitiyê çi fam dikin divê binivîsin. Dema ez têgeha yekitiyê dibihîzim ev tên bîra min: kurd divê li hemû parçên Kurdistanê xwedî statû bin; zimanê kurdî divê bibe zimanê perwerdeyê; li hemberî erîşên mêtingeran yek-helwest bin; divê rewşenbîr hunermend û nivîskarên kurd hemû aliyên sîyasî ji bo yekitiyê motîve bike, hişyar bikin; ji yekitiyê çi fam dikin, divê binivîsin û li gorî van rêgezan rê vebikin bo qada siyasetê.